
DICLE دجلة
kovaradicle@gmail.com ▪ Hijmar 29 ▪ sal 6 ▪ 2022/11/30



## Hebûn û azadî bêyî xweparastinê nabe


## Xwe parastina ji fermanan berpirsiyariya her jineke Êzidî ye

# Parastin ji nan û avê girîngtir e



Ş. MERWAN BEDEL (DIJWAR FEQÎR)





## DI VÊ HEJMARÊ DE


Hebûn û azadî bêyî xweparastinê nabe 5

Xwe parastina ji fermanan berpirsiyariya her jineke Êzidî ye.. 9

Jinên Êzidî li Şengalê şoreşê pêş dixin 13

Parastin ji nan û avê girîngtir e 16

Rêxistinbûn xwe ji fermanan parastin e 21

Xwe Ji Fermanê Biparêze 29

Dîroka Fermanan 35

Berxwedana 11 mehan hêviya jiyana azad geş kir 42

Avesta: Divê li Şengalê yek jin bi tenê jî bê rêxistin nemîne 47

Spasiya hevgirtinê: Nanê Dengê Şevê 49

Encamname û biryarên 2.Kongreya TAJÊ 51



Dıcle

Lêkolîn, Belge û Lêgerîn

Jimar: 29 MIJDAR : 2022

Xwediyê Kovarê û Rêvebera weşanê:
Azad Ebdal kirêt

Cigirê Rêveberê weşanê:
Sikran Ridînî Meshuc el.şemerî

Berpirsê weşanê:
Azad Ebdal kirêt

Desteya Weşanê:

- Xelîl Murad Şilo
- Omran Sekran Ridînî
- Îbrahîm Emo Kiçî

Sepandin û Derhênerî:
Qasim Xelif Abdulla
Qasim xidir
Navnîşan:
Şengal -Sincar-
Tel: 07843928589
07841718949

E. mail: kovaradicle@gmail.com
Hejmara Roxsat girtin Li Sendîkaya Rojnamevanî îraqî
1773

JI EDÎTOR

# Dem Dema Xwe Ji Fermanê Parastinê ye

Xwendevanên hêja:

Dem dema Xwe Ji Fermanê Parastinê ye

Roja me ya îro êrîşên li ser me çawa dimeşin, emê xwe Ji Fermanan Çawa Biparêzin, ji bo rê li ber fermanên nû bigirin wekî civaka Êzidî lazim e em çi bikin? Ev pirsen muhîm in ku me divê bersiva wan bidin. Beriya her tiştî, parastina Êzîdxanê ne tenê di stûyê Asayîşa Êzîdxanê û hêzên YBŞ-YJŞ'ê de ne. Rast e, ew hêzên me yên parastinê, fedayîyên Şengalê ne. Çiyayê Şengalê stargeha me ya pîroz, hêzên parastinê jî stûna hebûna me ne. Lê ji bo em xwe ji fermanan biparêzin erk û berpirsyarî dikeve ser milê herkesî. Çawa di dîrokê de li hemberî ferman û talanan hemû eşîrên me, hemû civaka me li ber xwe dane, îro jî lazim e em amade bin bi her awayî piştgiriya hêzên xwe yên parastinê bikin, barê wan sivik bikin û tu tiştek ji destê me neyê em kevirek bavêjin dijminên Êzdayetiyê. Em keç û xortên xwe tevlî hêzên xwe yên parastinê bikin, ev lazim e. Lê berxwedan ne tenê şerkirin e û ne tenê di stûyê hêzên parastinê de ye. Çawa ku em civaka Êzidî bêyî hêzên xwe yên parastinê nikarin hebûna xwe biparêzin, hêzên parastinê jî bêyî destek û piştevaniya gel nikare li ber xwe bide. Lazim e di dema êrîşan de hemû civak bi hêzên xwe yên parastinê re tevbigere, piştgirî û desteka xwe ya ji bo hêzên xwe bi bîr û baweriyeke xurt nişan bide, ji hêza xwe ya cewherî bawer bike, çawa ku em ji hêzên xwe yên parastinê hêz û destekê digirin, em jî destekê bidin hêzên xwe yên parastinê. Di dema êrîşan de yên ku karibin divê tevlî hêzên parastina cewherî bibin, hêza xwe xurt bikin. Yên nikaribin vê tiştê bikin; parastina gundê xwe, taxa xwe, mala xwe bikin. Ne ku hêzên parastinê li ber xwe bidin, em jî temaşe bikin. Çawa ku hêzên parastinê li dora Çiyayê Şengalê dibin xelek û nahêlin dijminên Êzdayetiyê bikevin çiyayê pîroz, em jî li dora keç û xortên Êzidî bibin xelek ku destê tu xwêrnexwazî negihe wan. Dema tu xwe nêzî hêlîna teyrekî bikî ka çawa dayika wan parastina wan dike, em jî zarokên xwe, fedayiyên vê axa pîroz biparêzin.

Em wisa bikin ku beriya dijminên me xwe bigihînin zarokên me, em derkevin pêşiya dijminên xwe, em rê nedin deste wan bigihe hêzên me yên parastinê. Ne tenê Çiyayê Şengalê, em karibin her gundeki, her malekî ji xwe re bikin stargeh, tedbîrên xwe yên parastinê li gund û malen xwe jî bigirin...

Qasî Fermana Reş, lazim e em li hemberî Fermana Sipî jî li ber xwe bidin. Dijminên Êzdayetiyê ji bo ol û çanda me tune bikin beriya her tiştî dixwazin me ji cih û warê me yê pîroz qut bikin, me ji axa me ya pîroz dûr bixin. Eger di hemû fermanan de dijminên me berê me dane koçberiyê ji bo vê armancê ye. Dijminên Êzidiyan her dem xwestine ku Êzidî ji Çiyayê Şengalê, ji Êzdîxanê qut bibin. Gotinek beriya heye, dibêje "Her gîha li ser koka xwe şîn dibe." Eger em ne li ser koka xwe bin, ne li dora qube, silavgeh û mezargehên xwe bin, ne li dora şehîdên xwe bin emê çawa hebûna xwe biparêzin? Êrîşê herî mezin a fermanê, koçberî ye. Lazim e em ji bîr nekin, eger em ji Çiyayê Şengalê û Êzdîxanê dûr bikevin, em ji Êzdayetiya xwe dûr dikevin. Em Rojperest in, lazim e her roj berê xwe bidine rojê, emê li welatên Ewropayê çawa karibin her roj berê xwe bidin rojê û baweriya xwe biparêzin? Bi hezaran zarokên Êzidî hene ku li Ewropayê ji dayik bûne, lingê wan li axa pîroz a Şengalê neketine, Cemayiyek pîroz nekirine, govenda Şengalî negerandine. Ewê zarokên me çawa karibin bîr û baweriya xwe, çanda xwe nas bikin û pê re bijîn? Çawa ku em xwedî bîr û baweriyeke qedim in, em xwedî cih û warên qedîm in. Hebûna me li van cihên pîroz e, eger ev cihên pîroz ji destê me biçin an jî em terka van cihên pîroz bikin, pir zehmet e em Êzdayetiya xwe biparêzin. Ji ber vê heqîqetê; Dem dema vegera Şengalê ye, ne çûyîna Ewropayê ye.

Her wiha, ji bo em karibin Xwe Ji Fermanan Biparêzin lazim e em dost û dijminên xwe nas bikin, dost û dijmin ji hev derxin. Eger em vê nekin, em nikarin parastina axa xwe, bîr û baweriya xwe, çand û dîroka xwe bikin. Çima? Eger em dostên xwe baş nas bikin emê karibin tifaqê pêş bixin, emê karibin hêza xwe bikin yek, emê karibin pişta xwe bidin dostên xwe û berê xwe bidin dijminên xwe. Lê eger em dijminên xwe nas nekin, em dost û dijmin ji hev dernexin wê çaxê tofanên mezin wê bi serê me ve werin. Me di fermana 2014'an de ev rastî dît. Em dereng pê hisiyan ku li şûna dostan me pişta xwe bi dijminên Êzdayetiyê germ kiriye. Em ji bîr nekin, zimanê şêrîn ne dostanî ye. Eger me ji piştê ve ewqas xençer xwarine, kêmasiyên me jî hene. Eger di fermanê de em bi gotina dijminên Êzidiyan xapiyane, ev kêmasiya me ye jî. Ji bo xençera îxanetê careke din li dilê Êzidiyan nekeve, lazim e em heqîqeta xwe baş nas bikin. Eger em xwe nas bikin, em dikarin dost û dijmin ji hev nas bikin.

Em di sedsala 21'emîn de ne, ne şer wekî şerên berê ne, ne parastina civakê wekî berê dikare were kirin, ne jî civaka me dikare wekî berê bijî. Rast e, hêzên parastina cewherî stûna hebûna me ne. Lê bi qasî hebûna hêzên parastinê tiştekî din a girîng heye; ew jî lazim e em civaka xwe perwerde bikin, birêxistin bikin û bigihînin hêza xwerêvebirinê. Xwe parastin çiqas muhîm be, xwe rêvebirin jî ewçend muhîm e. Ji ber vê heqîqetê, piştî fermana 2014'an me ne tenê hêzên parastinê birêxistin kir. Her wiha me xwe gihand hêza xwe ya rêvebirinê, bi pêşengiya şehîdên qehreman me Rêveberiya Xweser, sazî û dezgehên wê ava kirin. Niha dem dema parastina Şengalê, dem dema parastina Rêveberiya Xweser e. Dem dema Xwe Ji Fermanê Parastinê ye...

# Hebûn û azadî bêyî xweparastinê nabe




Çawa ku xwe xwedîkirin û xwezêdekirin nebe zindî û ruhber nikarin jiyana xwe dewam bikin, bêyî xweparastinê jî nikarin jiyana xwe dewam bikin. Encameke din a girîng ku mirov dikare ji cîhana xweparastinê ya zindiyan bigire ew e, ev xweparastin bi tenê ji bo parastina hebûnê ye

Di cîhana zindî û ruhberan de her cure û celeb li gorî xwe xwedî sîstemeke parastinê ye. Cureyekî bi tenê yê zindiyan tineye ku bêpa-rastin be. Heta mirov dikare li gerdûnê berxwedana her elementî û her perçikî ji bo parastina hebûna xwe weke xweparastinê şîrove bike. Berxwedana li dijî deformebûn û derketina ji xwebûnê eşkere bi têgînên xweparastinê tê îfadekirin. Kengî ev berxwedan têk biçe, ew element an perçik berepaş diçe, ji xwebûnê derdikeve, vediguhere hêmaneke din. Di cîhana zindiyan de kengî berxwedana xweparastinê bişkê, hingê ew zindî yan ji bo zindiyên din dibe xwarin an jî dimire.

Heman sîstem ji bo civak û cinsê mirov bi zêdehî di cih de ye. Cu-reyekî narîn mîna mirov û civaka wî hebûnên li tehlûkeyan vekirî xwepa-rastineke wan a bi hêz nebe nikarin hebûna xwe deme-ke dirêj li ser piyan bigirin. Li cem cinsê mirov parastin bi qasî ku biyolojîk e, ewqasî jî

civakî ye. Parastina biyolojîk li cem her hebûna zindî ji aliyê xerîzeyên parastinê ve tê pêkanîn. Parastina civakî jî bi hevpariyeke tevahiya ferdên komê tê bicihanîn. Heta li gorî derfetên parastinê hejmara komê û şêweyê rêxistiniya wê timî diguhere. Parastin yek ji fonksiyonên bingehîn ê komê ye ku dimeşîne. Jiyan bêyî parastinê ti carî nameşe. Çawa ku tê zanîn du fonksiyonên din ên bingehîn xwe xwedîkirin û xwe zêdekirin e. Çawa ku xwe xwedîkirin û xwezêdekirin nebe zindî û ruhber nikarin jiyana xwe dewam bikin, bêyî xweparastinê jî nikarin jiyana xwe dewam bikin. Encameke din a girîng ku mirov dikare ji cîhana xweparastinê ya zindiyan bigire ew e, ev xweparastin bi tenê ji bo parastina hebûnê ye. Li ser cureyên xwe, heta li ser hebûna cureyên din sîstemên mêtinkarî û serdestiyê ava nake. Cara pêşî li cem cureyê mirov sîstemên serdestî û mêtinkariyê pêk hatine. Di vê de pêşketina zêhnê cureyê mirov ê rê li ber derfetên mêtinkariyê vekiriye û bi vê ve girêdayî bidestxistina berhemê zêde bi tesîr bûne. Ev rewş ne bi tenê bergiriya hebûna xwe, herweha parastina nirxên kedê ango şerên civakî jî bi xwe re tîne.




**Êrîşên hêzên şaristaniyê li ser herêmê kêm nebûne**

Li gorî şertên berbiçav ên Kurdan xweparastin tevahiya dîrokê ji bo wan her tim girîng bû. Ji ber ku komên Kurdan demeke dirêj û hûrûkûr bi şoreşa neolîtîkê rabûn û di dereceya yekemîn de paşhatiyên wê bûn, timî bi êrîşan re rûbirû bûn. Ji ber hatin û berhemên zêde yên şoreşa cotkariyê li Kevana Bi Bereket timî êrîşan di rojevê de cih girtin. Bi hezaran salan bi vî awayî dewam kir. Piştî ku sîstemên şaristaniyê yên li ser berhemên zêde xwe bi pêş xistin, hêzên xwe di çarçoveya bajar, çîn û dewletê de ava kirin, dema êrîşên wan ên bi pîlan û sîstematîk jî dest pê kir. Ji şaristaniya Sumeran heta bi hêza herî dawî ya hegemon a şaristaniya serdest a roja me ya îro DYE bêhejmar hêzên şaristaniyê êrîşên wan ên yekser an neyekser li ser herêmê û komên wê kêm nebûne.

**Dewlet netewe, hebûna Kurdan dixe tehlûkeyê**

Bi modernîteya kapîtalîst re êrîşên dused salên dawî ketine kira-sekî din û rengekî din girtine. Ji serdema destpêkê ve weke yekeyên qebîle û eşîran li qadên çiyayî bergiriya hebûna xwe kirine ango xwedî sîstemeke xweparastinê bûn, lê li hemberî amûrên êrîşê yên bi sîstema kapîtalîst re derketine holê ev sîstema wan a bergiriyê kêm ma û têrê nekir. Cara pêşî ye ku tehlûke çêdibe hebûna xwe ji dest bidin û ev dikeve rojevê. Ji aliyê Kurdan ve, avahiya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst, ne



**Ji serdema destpêkê ve weke yekeyên qebîle û eşîran li qadên çiyayî bergiriya hebûna xwe kirine ango xwedî sîstemeke xweparastinê bûn, lê li hemberî amûrên êrîşê yên bi sîstema kapîtalîst re derketine holê ev sîstema wan a bergiriyê kêm ma û têrê nekir**

bi tenê azadiyên wan ji destên wan digire, di heman demê de dibe sedem ku hebûna wan jî bikeve tehlûkeyê. Di nava sînorên siyasî de bername û çalakiya 'tek ziman', 'tek netewe' û 'tek welat' hatiye meşandin û di nava wan sînoran de jî ziman, netewe û welatên din bi înkar û îmhayê re rûbirû bûn. Kurdistan hat parçekirin û dewletên netewe, Kurdên li her parçeyî xistin nava diranên înkar û îmhayê. Dewletên netewe yên ku hêzên hegemonîk piştgiriya wan dikirin, tesfiyekirina Kurd û Kurdistanê weke polîtîkayên bingehîn qebûl kirin. Kengî berxwedana xweparastinê ya Kurdan kêm ma û şikest, hingê dor hat hilweşîn û jihevdeketina civakê, û bi vê re komikên civakê yên mayî bêne asîmîlekirin û tesfiyekirin.

**Tevgera azadiyê veguherî şerê xweparastina gel**

Vê pêvajoya tesfiyekirinê bi dijwarî dewam kir. Tevgera PKK'ê weke nerazîbûnekê derket holê û di destpêkê de bi awayekî bingehîn tevgera xweparastinê ya Kurdan e. Tevgera xweparastinê ya pêşî bi awayekî îdeolojîk û polîtîk hat meşandin, di demeke kin de gav avêt qonaxa xweparastinê ya li ser bingehê şîddeta li beramberî hevdû. Parastina çekdarî bi Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an re gel jî xist çarçoveya xwe û bi vî awayî berê xwe fireh kir. Tevger veguherî şerê xweparastina gel û lewma bû hedefa êrîşên bi plan ên hêzên hegemonîk ên pêwendîdar hemûyan, nexasim hêzên NATO-Gladîo. Bi tevahî hêzên ditirsiyan ku Kurdên li Kurdistanê li ser çarenûsa xwe bibin xwedî gotin û tewazunên li herêmê serûbinî hev bikin, li pişt van êrîşan cih girtin. Lê tevî vê jî van şerên berxwedanê derbeke mezin li polîtîkayên înkar, îmha û asîmîlasyonê dan. Xwedîderketina gel a li nasnameya xwe û helwesta bi israr a ji bo jiyana azad misoger kir. Herçiqasî bi tevahî armancên berê yên dewletên netewe ji bo tesfiyekirina gelê Kurd bi dawî nebûbin jî weke berê îddîayên wan nemane. Em gihiştine wê qonaxê ku nasnameya Kurd bê qebûlkirin û ji jiyana xweser re rêz bê nîşandan. Ev rewş ji aliyê şerê xweparastinê ve rewşeke nû ye.

**Hebûn û azadî bêyî xweparastinê nabe**

Di avakirina neteweya




demokratîk de sernavekî girîng ê berna-meyê û bêyî wî nabe, xweparastin e. Ango sîstematîka xweparastineke mayînde wê çawa bibe. Dewletên netewe yekdestdariya hêza sîlehê bi tenê di destê xwe de digirin û kengî keysê lê bînin di polîtîkayên nû yên înkar, îmha û asîmîlasyonê de bi kar tînin û ev yek jî me neçarî sîstemeke mayînde ya xweparastinê dike. Ji bo jiyaneke hevpar bi dewletên netewe re şert e ku bi kêmanî nasnameya Kurd û jiyana wî ya azad bi destûra bingehîn bê misogerkirin. Bêguman misogeriya bi destûra bingehîn têrê nake, wekî din divê bi statuyên bi qanûnan bê diyarkirin li şertên berbiçav ên vê misogeriyê bê pirsîn. Ji bilî parastina neteweyî ya hevpar a li dijî derve, karûbarên ewlekariyê yên hundir divê civaka Kurd bi xwe pêk bîne. Ji ber ku herî baş civakeke bi xwe pêdiviyên xwe yên ewlekariya hundir dizane û dikare bi awayekî di cih de pêk bîne. Lewma divê dewletên netewe yên pêwendîdar (dewletên netewe yên navendî Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûrî) di polîtîkayên xwe yên ewlekariya hundir de reformên girîng bikin. Li ser bingehê lihevkirina bi dewletên netewe re û di çarçoveya ewlekariya hundir a qanûnî de ji nû ve birêkêpêkkirina hêzan mumkîn e.

Eger bi dewletên netewe yên pêwendîdar re lihevkirin nebe, KCK wê hewl bide bi awayekî yekalî avakirina neteweya xwe ya demok-ratîk di çarçoveya parastina hemû alî û şaxên wê de, hêzên xwe yên xweparastinê ji aliyê hejmar û naverokê ve li gorî pêdiviyan ji nû ve bi rêkûpêk bike. Hebûn û azadiya Kurdan û Kurdistanê bêyî xweparastinê nabe.

# Xwe parastina ji fermanan berpirsiyariya her jineke Êzidî ye



Bêrîvan Şengalî

Ew roj ne dûr in ku pêxwas, bi tirs, perîşan bibûn. Bi dilekî tijî kul û keder, tirs û xof bûn, serî tijî bi guman û hêvî bi rojan li ser axa Şengalê, li ber koçan, li bin daran, li ber tava tûj a meha Tebaxê ketibûn rêyan, koçber bibûn, hatibûn revandin, hatibûn kuştin û şehîd xistin, hatibûn firotin û rastî destdirêjiyên hovan hatibûn. Di ser re tenê 8 sal derbas bûne. Wan rojan jinên Êzidî pêxwas, birçî û tênî bi hêviya ku hinek xwe bigihînin hawara wan qîr û hawar dikirin, bi çavên tijî girî, bi lêv û bedenên dilerizî zarokên li hembêza xwe di dil û hinavên xwe de bi şidahiyekê bê tarîf hembêz dikirin, dapîr û bapîrên nedikarîn bimeşin didan pişta xwe, destê wan digirtin û bi hêvîya çend gavên din jî ji wan hovan dûr bixînin dua dikirin, bi rica û minet re xwe diavêtin ber lingên wan û hewl didan wan qaneh bikin ku bimeşin, bi hêvîya ku ji fermanê rizgar bibin û bifilitin.

**Ji bo civak xwe nekare biparêze her tişt kiribûn û yên hewldidan xwe biparêzin jî li Zorava şehîd xistibûn. Îro ti Şengalî, ti Kurdekî bi vîcdan ne dixwaze wê peşmergetiya wan, ne jî Kurdeyatiya wan ku xwe nîşanî jina Êzidî dabû cardin bibihîse û bibîne.**

**bi çavê xwe dîtibûn ku şervanên azadiyê li ser fikir û ramanên Serok APO, ev peyam dabûn wan: "Jin encax herî zêde êş û azara jinê hîs dike, jin encax herî zêde wê fam dike û xwedî lê derdikeve." Ji ber wê ye îro bi hezaran jinên Êzidî çek hilgirtin, perwerda parastinê dibînin û ji bo xwe ji fermanan biparêzin seferber bûne.**



Lê belê mixabin yên karibana alîkar bibin, yên jê bawer kiribûn li ku mabûn gelo? Li ku derê bûn ew bav, bira, hevjînên wan, li ku derê bûn hevalên wan ku ji wan re soza parastina wan dabûn? Li ku derê bûn artêşa dewleta Iraqê ku bi cil û bergên xwe, rext, bejin û bala xwe ve li kolanên Şengalê digeriyan û xwe nîşanî wan didan? Çi dikirin wan peşmergeyên ku xwe 'canbexşê axa Kurdistanê' binav dikirin? Di rastiyê de 'peşmergeyên roj' bûn ku pêşiya milet girtin, çekên wan komkirin, dan sekinandin û ew teslîmî çeteyên DAİŞ dikirin, pişta xwe didan milet û baz didan. Ji bo civak xwe nekare biparêze her tişt kiribûn û yên hewldidan xwe biparêzin jî li Zorava şehîd xistibûn. Îro ti Şengalî, ti Kurdekî bi vîcdan ne dixwaze wê peşmergetiya wan, ne jî Kurdeyatiya wan ku xwe nîşanî jina Êzidî dabû cardin bibihîse û bibîne.

Wê rojê ti kesî nekarîbû jina Êzidî rizgar bike, ew bê xwedî mabû, bê parastin û bê rêxistin bû. Ji ber wê jî bi hezaran jin ketibûn destê çeteyên DAİŞ'ê, bi hezaran hatibûn kuştin û koçber kirin. Tevahiya cîhanê îro qebûl dike ku herî zêde jina Êzidî êşa fermanan jiyaye, herî zêde ya ji xwe can û cîger daye her car ew bûye. Cardin hatibû ispat kirin ku ji bilî jinê ti kes alîkarî nade wê, wê naparêze, wê pêşnaxe û ava nake. Ji ber wê ye dema gerîlayên HPG-YJA Star, YPG-YPJ'ê bi cilên leşkerî, bi keziyên zêrîn xwe gihandibûn wan, pir kelecan girtibûn û bi çavê xwe dîtibûn ku şervanên azadiyê li ser fikir û ramanên Serok APO, ev peyam dabûn wan: "Jin encax herî zêde êş û azara jinê hîs dike, jin encax herî zêde wê fam dike û xwedî lê derdikeve." Ji ber wê ye îro bi hezaran jinên Êzidî çek hilgirtin, perwerda parastinê dibînin û ji bo xwe ji fermanan biparêzin seferber bûne.

**Jina Êzidî hêvî û baweriya xwe ti demî wenda nekir**

Jina Êzidî di hemû fermanan de bû hedefeke sereke. Sedema wê jî ji ber ku ew bingehê jiyanê bû. Bêsedem nîne ku îro dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" li çar aliyê cîhanê deng vedaye. Jin jiyan e, heger bixwazin wê



## Xwe ji fermanan rizgar kirin di serî de zanebûnê dixwaze: Em kî ne? ji ku derê hatine? Em xwedî dîrokek çawa ne? Pêşengên me kî ne? Bawerî û nirxên me çi ne? Em divê çawa pêşwazî bikin, çawa bijîn da ku em bi wan nirxan ve girêdayî bijîn?

jiyanê tine bikin yê di serî de jinê bikin hedef. Wek encama 74 fermanên di dîrokê de pêk anîn, di serî de her car heman hedefê dan pêş xwe; yê çawa bikarin jina Êzidî cismen tine bikin, heger nekarin tine bikin jî dê çawa bikarin wê ji baweriya wê, ji çanda civaka wê, ji hêviyên wê, ji ziman û pêşeroja wê ya Êzdîyatiyê dûr bixin. Dê çiqas bikarin wê bikin misilman, şîa, sunne, file, dê çiqas bikin Ereb, Faris, Tirk û ji miletên din.

Îro dema em li Şengalê digerin di çav û awirên jinan de, jinên cîwan de em êşên kûr ji çavkaniya dîroka bi êş, azar û fermanan dikarin bibinin. Çavên tirsandî, hêvîyên pirtikandî, mereq û lêgerîna tepisandî, jiyanek di kêliya tê de hepiskirî ye. lê bi van jinan re heman demî bawerî û hêviyeke veşartî ya ji dil û hinavê tê jî heye, ji ber wê ye zimanê xwe ji bîr nekirin, baweriya xwe terk nekirin, pişta xwe nedan irf û edetên xwe. her çiqas jê pir tişt hatibe girtin, pê dabin wenda kirin jî kok zindî ye, kok kûr û saxlem e.

**Xwe parastina ji fermanan mîsyona sereke ya jina Êzidî ye**

Ji ber ku koka civaka Êzidî pir eleqeyî rewşa jina Êzidî ye; xwe ji Şengalê, ji civakê, ji pêşeroja statuya Êzidiyatî berpirsiyarî jî hildigire. Ev ne tercîh e, ev mecbûriyeta hemû jinên Êzidî ye. Ev ne mecbûriyetekî ji derve tê ferz kirin e, ev mecbûriyetekî vîcdanî û ehlaqî ye, ketina ferqa xwe, hêz, rol û mîsyona xwe ye. Van mecbûriyetên xwe pêk neyne yê civak tine bibe, yê nirxên civakê nemîne. Ev erk û mîsyona jina Êzidî parçeyek hebûna wê ye, ji ber wê ye jî barê wê ji herkesî girantir e. Xwe ji fermanan rizgar kirin û xwe parastinê divê herî zêde jina Êzidî cidî bigire û wekî mijareke jiyanî bibîne, bizane û ji bo wê tekoşîn bike, xwe birêxistin bike. Ji ber wê ye her roja em pêş ve diçin jina Êzidî rêxistinbûna xwe pêş ve dibe, saziyên xwe yên xweser ava dike, rêveberiyên xwe hildibijêre, civînên xwe pêk tîne û perwerdeyên xwe dibîne. Ji




xwe ji bo xwe parastinê hinek xebatên di serî de divê bêne pêşxistin jî ev in. Xwe ji fermanan rizgar kirin di serî de zanebûnê dixwaze: Em kî ne? ji ku derê hatine? Em xwedî dîrokek çawa ne? Pêşengên me kî ne? Bawerî û nirxên me çi ne? Em divê çawa pêşwazî bikin, çawa bijîn da ku em bi wan nirxan ve girêdayî bijîn? Di van û gelek mijarên din de zanebûnê dixwaze. Zanebûna ku ji her jina Êzidî re xwedibûna armanceke mezin bîne dixwaze.

Gelo armanc divê çi be? Bêgûman divê jiyaneke bi nirx û azad be. Jiyanek li gorî nirx û pîvanên Êzdiyatiyê be, bi zanebûn û exlaq be. Bi zimanê dayikê be, bi dîrok û nasnameya xwe be, bi çand û baweriya xwe be. Bi rih û manewiyata ax, welat û civaka xwe be. Ji bo vana jî têkoşîn û xwe birêxistin kirin şert e. Jina Êzidî xwe çiqas birêxistin bike û di van xalan de rol û mîsyon bigire ser milê xwe û pêşengtî bike yê ewqas xwe, civak û welatê xwe ji fermanan biparêze, yê ewqas bikare pêşerojekê tijî hêvî, azadî û bi garantiya statû û nasnameya Êzdiyatiyê ava bike. Yê ewqas bikare bê tirs û gûman bi keyfxweşî û aramiya pêşerojeke azad bo zarokên xwe, xwişk û birayên xwe jiyan bike. Bi hêviya ku ew roj ji her demê nêztir e ji jina Êzidî re...

**lê bi van jinan re heman demî bawerî û hêviyeke veşartî ya ji dil û hinavê tê jî heye, ji ber wê ye zimanê xwe ji bîr nekirin, baweriya xwe terk nekirin, pişta xwe nedan irf û edetên xwe. her çiqas jê pir tişt hatibe girtin, pê dabin wenda kirin jî kok zindî ye, kok kûr û saxlem e.**

# Jinên Êzidî li Şengalê şoreşê pêş dixin





Suhem Şengalî

Civaka Êzidî li ser axa Mezopotamyayê civakek herî qedîm e. Di nav dîroka civaka Êzidî de jî jin xwedî dîrokeke taybet e. Civaka Êzidî di nav dîrokê de rastî 74 fermanan hatiye. Eger baş were lêkolînkirin emê bibinin ku herî zêde jinên Êzidî ji van fermanan zerarê dîtine. Tiştê em ji vê rastiyê fam dikin çi ye? Ya ku çand, ziman, bawerî diparêze sekna jina Êzidî ye.

Dema em behsa fermanan dikin ne tenê komkujî çêbûye û civak sekiniye, vê çandê xwe berdewam kiriye. Ruxmê hemû êrîşan jî dîroka berxwedana jinên Êzidî heye. Di nav civaka Êzidî de bi dehan jinên navdar hene. Hin ji wan di warê çandî de, hin ji wan di warê civakî de, hin ji wan jî di warê parastinê de pêşengî li civaka Êzidî kirine. Her yek bi taybetmendiyek xwe pêşengî ji civakê re kirine. Civakê, ev tişt ji xwe re pîroz dîtîye. Cihê jinê di nav vê baweriyê de, di nav vê çandê de heye. Tiştê ku îro jinên Êzidî lê xwedî derdikevin, ev mîrasa dîrokî ye. Di fermana herî dawî de jî herî zede êrîşê jinê hate kirin. Jenosîda civaka Êzidî di şexsê jina Êzidî de hatiye jiyan kirin.

## 'Jinên Êzidî dîtin ku rêxistin nebe hebûn jî nabe'

Di vê sedsalê de jenosîda herî mezin a civaka Êzidî, di şexsê jinê de hatiye jiyan kirin. Ji ber vê rastiyê kîn û nefreta jinên Êzidî li dijî van êrîşan gelek xurt e. Ne tenê kîn û nefret, jina Êzidî xwe li hemberî fermanan birêxistinkiriye. Ev, bersiva hemû fermanên di dîrokê de ye. Piştî fermanê jinên Êzidî dîtin ku eger mirov ne bi îrade be, ne birêxistinî be, hêza wê nebe wê nikaribe hebûna xwe biparêze. Gava yekemîn, parastina hebûna xwe ya li ser vê axê bû. Di fermanê de beşeke

ji civaka Êzidî li Çiyayê Şengalê man û biryara xwe rêxistinkirinê dan. Hebûna jina Êzidî ya li Şengalê rûmeta mirovahiyê bû. Bi rizgarkirina Şengalê re jî hêza xwe ya parastinê ava kirin. Li Şengalê îro di warê siyasî, aborî, civakî de gelek gavên mezin hatine avêtin. Ne ku ferman xilas bûye û êrîş sekiniye, êrîşên îro heyî ji yên çeteyên DAÎŞ'ê hovanetir in. Bi taybet li ser jinên Êzidî şerê taybet tê meşandin. Hemû hewldan ew e ku civaka Êzidî li ser vê axê nemîne. Armanca êrîşan, armanca şerê taybet ev e.

**PDK li ser jinên Êzidî şerê taybet dimeşîne**

Li hemberî van êrîşan tiştê herî esasî zanebûn e. Li ser çand û zimanê civaka Êzidî êrîşek heye. Însan ku li ser axa xwe nemîne rû bi rû helandinê tê. Cihê esasî ku Êzidî karibin wekî Êzidî bijîn û bi serbilindî bêjin 'Em Êzidî ne' Şengal e. Ji ber vê heqîqetê ji bo Êzidiyan Şengal bûye paytext. Di vir de rola herî esasî ya jinên Êzidî ye. Çawa ku êrîş destpêkê jinên Êzidî hedef digire, lazim e jinên Êzidî jî pêşengiya parastinê bikin. Em dikarin cewhera Êzdayetiyê ji dayikên

**Jina ku xwe perwerde dike, tevlî sazîbûn û rêxistinbûnên xwe dibe, civînan birêve dibe, pêşengtî di daxwaz û talebên civaka xwe re dike xewne reşkên êrîşkaran û dijminên civaka Êzidî ne. Bila jina Êzidî bibîne ku li wan xewne reşkan dayîna dîtin marîfetekî herî bi nirx e.**

Êzidî, jinên Êzidî fam bikin. Li hemberî ferman û êrîşan sekn û berxwedana jinên Êzidî li cîhanê deng veda. Doza Êzdayetiyê di esasê xwe de doza jinên Êzidî ye.

PDK li ser jinên Êzidî siyaseteke pir zirav dimeşîne. Îro li kampên Başûrê Kurdistanê herî zede êrîş li ser jinên Êzidî têne kirin. Kuştina Axîna biçûk nişan de ku rêbazên hovitiya DAÎŞ'ê berdewam dike. Eger rêxistin xurt nebe û têkoşîn berfireh nebe, ev êrîş wê berdewam bikin. Lazim e civak zêdetir bikeve nav zanîna xwe parastinê. Parastin bê zanist nabe, rêxistinbûn bê zanist nabe. Tu bixwazî vê çand û baweriyê biparêzî lazim e rêbazek te ya zanistî hebe. Jinên Êzidî bi rêbazê xwe perwerdekirinê dikarin zêdetir deskeftiyên xwe mezin bikin.

**Parastin û rêxistinkirin gelekî girîng e**

Di van rojan de jinên Êzidî bi pêşengiya TAJÊ kongreya xwe ya duyemîn lidarxistin. Ev kongre di roja rizgarkirina Şengalê de pêk hat, rizgarkirina Şengalê ji bo me wekî rojbûnek e, ji ber ku axa me ji deste hovan hate rizgarkirin. Di vê rojê de biryara mezinkirina têkoşînê dayîn, gelek girîng e. Dijminên Civaka Êzidî gelek in, yê ku herî zêde dixwaze Êzidî koçber bibin, ji axa xwe dûr bikevin PDK ye ku ji bo vê jî şerê taybet dimeşîne. Bi




taybet li Başûrê Kurdistanê li ser civaka Êzidî, li ser jinên Êzidî siyaseteke pir qirêj tê meşandin.

Bi taybetî di vê pêvajoyê de parastin gelekî girîng e, parastina çanda xwe, hebûna xwe, nirxên xwe. Lazim e mirov li hemberî lîstokan hişyar be. Ne dewleta tirk, ne Iraq ne jî PDK Êzidiyek bi îrade qebûl nakin. Dixwazin civaka Êzidî her dem mihtacî wan be. Ji ber vê naxwazin rêxistinbûna civaka Êzidî xurt bibe. Wekî TAJÊ lazim e em vê siyasete ji nêz ve bişopînin.

**Rêxistinkirina hemû jinên Êzidî armanc e**

Ji bo TAJÊ, rêxistinkirina hemû jinan ji bo me hedef e. 25'ê Mijdarê nêzîk dibe û em li hemû cîhanê dibinin ku ev sedsal dibe sedsala azadiyê jinê. Rêber APO got, 'Sedsala 21'emîn wê bibe sedsala azadiya jinan.' Li Rojhilatê Kurdistanê serhildana jinan mezintir dibe. Li çiyayên azad gerîlayên YJA-Starê li ber xwe didin. Li cîhanê li hemberî sîstema ku hebûna jinê nas nake, serhildaneke di asta herî jor de heye. Ji ber vê pêngava 'Dem dema parastina şoreşa jinê ye' hatiye destpêkirin.

Li Şengalê jî ya ku herî zêde şoreşê pêş dixe jin e, ew dem e ku em şoreşa xwe biparêzin û pêşengtî ji civaka xwe re bikin. Eger jina Êzidî li Şengalê ne xwedî îrade be wê civaka Êzidî jî nikaribe îradeya xwe biparêze. Îradekirina jin di qada parastinê de jî hedefek me ye. Parastina cewherî di vê pêvajoyê de xala herî girîng e. Ya din jî pêşxistina yekîtîya jinan. Eger jinên Êzidî yekîtîya xwe ava bikin wê karibin li hemberî êrîşan Şengalê biparêzin, jinên Êzidî biparêzin.

# Parastin ji nan û avê girîngtir e





Îbrahim Êzîdî

Di Rojhilata Navîn de, bi taybetî jî li Îraq û Sûriyeyê bi sedhezaran gelê medenî di encama şerên ku ji aliyê hêzên desthilatdar ve têne birêvebirin hatine qetilkirin. Civakên ku li ser vê axê dijîn her dem bûne qurbaniyên siyaseta desthilatdaran û desthilatdar her xwestine şerê xwe yê berjewendîperest li ser hesabê civakan geş bikin. Bêguman her şerekî li van herêman rû daye di berjewendiya hin welatên serdest de bûye. Gelên bêrêxistinkirî ku di dirêjahiya dîrokê de her para xwe ji şer û aloziyan girtine di roja me ya îro de jî bi heman awayî di bin zext û qirkirinê de ne.

Rojane li cîhanê bi hezaran kes tên qetilkirin, li hin ji welatan jî ji birçîna dimirin. Li vir ez dixwazim bêjim em di sedsala 21'emîn de ne, li gorî hin şiroveyan cîhan di vê sedsalê de pir pêşketiye. Ev pêşketin ku ji aliyê welatên kapîtalîst ve

**Ev şîdeta ku niha li cîhanê tê kirin, di berjewendiya hin welatan de ye lê ji ber ku di rewşa heyî de mirovahî hatiye beramberî hev, her kesek bi qetilkirina kesê din kêfxweş dibe, tu kes nafikire ku di rastiyê de jiyan tê qirkirin.**

tê şirovekirin, ji bo civakan zirareke herî mezin e , lê gel ne di wê ferqê de ye ku ev pêşketina kapîtalîst ji bo qirkirina wan e. Bi wê nafikirin ku sedem çi ne hewqas kes tên qetilkirin û welatên serdest çiqasî şîdet li cîhanê û di nav ol û civakan de pêşxistine.




**Di rastiyê de jiyan tê qirkirin**

Ev şîdeta ku niha li cîhanê tê kirin, di berjewendiya hin welatan de ye lê ji ber ku di rewşa heyî de mirovahî hatiye beramberî hev, her kesek bi qetilkirina kesê din kêfxweş dibe, tu kes nafikire ku di rastiyê de jiyan tê qirkirin. Di dîrokê de jî şîdet û amûrên şîdetê her hebûn lê ev şîdet ne ji bo desthilatdariyê bû belkû ji bo jiyanê bû. Ev şîdet jî bi amûran dihate kirin ku di serdema em tê de ne jê re dibêjin Çek. Di dîrokê de êl, eşîr, qebîle û qewman ji bo parastina hebûna xwe amûrên parastinê bikaranîne

lê bikaranîna wan ji bo civak yan jî takekî karibe xwe biparêze û bide jiyan kirin bû













Piştî ku hejmara mirovan ber bi zêdebûnê ve çû ji malbatan heya qebîleyên çolê ji bo karibin bijîn û xwe biparêzin gava yekemîn lêgerîna li amûrên parastinê bû. Qebîleyan li hemberî qebîleyên din an jî hêzên desthilatdar dest bi xwe parastinê kirin. Parastin jî bi wan amûran dihate kirin. Di vir de ji me re tê xuyakirin ku ti civak di dîrokê de bê parastin nemane û her çeka parastinê di destê civakê de bûye. Bi pêşketina teknolojiyê û sîstema desthilatdarî yan jî dewletê re cûrên şîdetê hatine guhertin û çek hatine pêşxistin. Êdî ji bo desthilatdariya xwe biparêzin her cûreyê çekan hatine çêkirin. Ev çek ne ji bo ku civak karibe xwe pê bide jiyan kirin belkû ji bo tunekirin û bêdengkirina civakan hatine çêkirin.

Civakên ku xwestine xwe ji sîstema desthilatdariyê dûr bikin neçar mane rêbazên bikaranîna amûrên xweparastinê pêşbixin. Bi taybet gelê Kurd ku bi avabûna sîstema dewletê re her hatine hedefgirtin ji ber ku amade nebûne ku xwe radestî sîstema dewletê bikin. Her dem jî dewlet û desthilatdarî li dijî Kurdan derketiye. Xwestine wan bê çek bihêlin û civakbûna wan û jiyana wan a xwezayî nehêlin.

**Ferman jî berxwedan jî her hebûye**

Ji bo ku Kurd karibin xwe biparêzin gelek şoreş pêşxistine lê ji ber ku xwe di fikir û armancên xwe de îqna nekirine her dem derb xwarine. Lê piştî avabûna PKK'ê êdî Kurdan jî kariye çanda xwe ya xwezayî û çiyayî biparêzin. Civakên ku xwe li ser fikir û ramanên Rêber Abdullah Ocalan birêxistinkirine bi ti awayî teslîmiyet qebûl nekirine. Çawa gelê

**Civaka Êzidî ku yek ji civakên herî kevnar e û heya niha ji her kesekî zêdetir li bîr û baweriyên xwe xwedî derketiye ji her civakekê zêdetir jî bûye hedefa sîstemê. Civaka Êzidî xwe ji fermanan parastiye, ango berxwedan û ferman jî herdem berdewam bûne.**

Kurd ev bi dehan salan e xwe li ser vî fikrî birêxistinkirine û xwe diparêze, di heman demê de ji aliyê hêzên ku dixwazin xwe li ser tevahiya civaka bikin serwer tên hedefgirtin lê herdem parastin hatiye kirin û gelê Kurd kariye hebûna xwe îspat bike.

Civaka Êzidî ku yek ji civakên herî kevnar e û heya niha ji her kesekî zêdetir li bîr û baweriyên xwe xwedî derketiye ji her civakekê zêdetir jî bûye hedefa sîstemê. Civaka Êzidî xwe ji fermanan parastiye, ango berxwedan û ferman jî herdem berdewam bûne. Ev ferman di bin navên cûda cûda de hatine ser Êzdiyan. Lê ji 74 fermanan piranî ji aliyê dewleta Osmanî ve bûne ji ber ku di Rojhilata Navîn de dewleta Tirk temsîliyeta sîstema desthilatdar dike û dixwaze çanda koletî li Rojhilata Navîn belav bike. Civaka Êzidî jî amade nebûye vê sîstemê qebûl bike. Ji ber wê jî hatine hedefgirtin û heya niha rastî 74 fermanan hatine.

Di roja me ye îro de jî ev pilan li ser Êzdiyan dewam dikin. Ji ber ku di 3'ê Tebaxa 2014'an de şagirtên Rêber Abdullah Ocalan bi hawara civaka Êzidî ve hatin êdî Êzdiyan karibû heya astekê rê li ber fermanan bigirin. Civaka Êzidî pişta xwe bi fikir û ramanekî girêdan ku dikare bingeha civakê biparêze û bike xwedî îrade ku ew jî fikrê Rêber Abdullah Ocalan e.

**Dixwazin civakê ji sîstema xweparastinê dûr bixin**

Piştî fermana 3'ê Tebaxê, Êzdiyan pergala netewa demokratîk ji xwe re esas girtin, sazî û dezgehên xwe avakirin û xwe diparêzin. Parastina Êzdiyan li ser wê esasê ye ku hebûna xwe ya bi hezarên salan e di hedefe desthilatdaran de ye biparêzin, bi vê armanca pîroz jî rêxistina xwe ya parastinê ava dikin. Civaka Êzidî çekê ji bo parastina xwe ya rewa, ji bo xwe ji fermanan biparêzin bikartînin. Ev parastina ji fermanan jî ne bi dilê dewlet û desthilatdariyê ye, lê ji nan û avê girîngtir e ji bo Êzdiyan. Niha ev sîstema xwe parastina ji fermanan ku bi beşek jê bi hilgirtina çekê pêk tê, bûye hedefa dagirkeran û bi pêşengiya dewleta Tirk dixwazin civakê ji vê sîstema xwe parastinê dûr bikin.

**Dixwazin civaka Êzidî bêçek û bêparastin bihêlin**

Li ser esasê hilweşandina pergala netewa demokratîk, di 9'ê Cotmeha 2020'an de bi navê Peymana Şengalê di navbera Hewlêr û Bexdayê de lihevkirin çêbû. Ev lihevkirin raste rast ji aliyê welatên ku pêşengtiya sîstema desthilatdar dikin ve hate pilankirin. Ji ber wê jî xala esasî ku ji xwe re asteng didîtin parastin bû, li ser vî esasî di Peymana 9'ê Cotmehê de yek

**Ev parastin bi tenê têrê nake loma civaka Êzidî pêngava "Xwe Ji Fermanê Biparêze" ango pêngava parastina cewherî daye destpêkirin. Di serî de jin, ciwan û hemû takên civakê di nav lêgerîna parastina rewa de ne.**

ji bendên ku hebûna Êzdiyan dike xeteriyê ew e ku pêwîst e çek ji destê gel derkevin û her çekekî di bin kontrola dewletê de be. Lê Êzdiyan li ber xwe dan, ev peyman qebûlnekirin û heya niha jî di nava tekoşînê de ne. Di destpêka gavên ji bo pêkanîna Peymana 9'ê Cotmehê de, artêşa Îraqê dest bi lêgerîna çekan kir lê civak li dijî wan derket û bi israr bûn ku ewê li hemberî her êrîşekê ku ji aliyê kê ve bê kirin wê xwe biparêzin.

Ev parastin bi tenê têrê nake loma civaka Êzidî pêngava "Xwe Ji Fermanê Biparêze" ango pêngava parastina cewherî daye destpêkirin. Di serî de jin, ciwan û hemû takên civakê di nav lêgerîna parastina rewa de ne. Bi vê rêxistina ku niha li Şengalê heye jî Êzidî dikarin heya astekê xwe biparêzin lê lazim e pergala parastina cewherî di nav hemû civakê de şax vede, hemû civak bibe parçeyek ji sîstema parastina Şengalê. Ji ber ku Fermana Reş jî Fermana Spî jî li ser serê Êzidiyan berdewam dike. Civaka Êzidî di ferqa vê xeteriyê de ye, ji bo rê li ber hemû cûre fermanan bigire bi navê "Xwe Ji Fermanê Biparêze" dest bi pêngaveke nû ya dîrokî dike





# Rêxistinbûn xwe ji fermanan parastin e





Yezda Havîn



Cîhan bi hemû nijad, kom û civakan ve bi xwezayê re temenekî dirêj wext bihurandiye. Di nava zimanê vî wextê dema temenê dirêj de tecrubeyek ji keda desta girti ye. Çiqas dîtiye û jiyaye nifûsa xwe zêde bûye û di encama wê de astekî çawanî û çendînî pê re bidest xistiye. Ev tecrube bûye bingehê berhem û daneheva salan ku xwe birêve bibe.

Dîrokê, bi van danehev û tecrubeyên gerdûnî bi enerjiya mirovan bingehekî ber bi civakîbûnê ve avêtiye. Bi civakîbûnê ve pirsgirêka xweparastinê jî derdikeve holê. Ji ber zêdebûna hejmarê û belavbûna mirov rê li ber qonaxeke nû vedike.

Di destpêka mirovahiyê de pirsgirêka parastinê li dijî afetên xwezayî û heywanên dirinde rû dide. Mirov ji bo xwe ji afêtên xwezayî û heywanan biparêzin xwe lihev digirin. Di encama parastinê de tekiliyê mirov bi mirov re, tekiliyê mirov bi xwezayê re di nava jiyaneke aram, yekgirtî û azad de pêş dikeve. Dijminatî di navbera mirovan de nîne,

**Di gerdûnê de her zindî xwedî mafê parastinê ye. Heta parastin mafekî xwezayî ye. Mirov jî yek ji cureyê zindiyên xwezayê ye. Her zindî xwe bi pergalekê diparêze. Rêber Apo di derbarê vê mijarê de wiha dibêje; "Gulek ji bo xwe biparêze stiriyê xwe hene."**

hevûdû kuştin nîne, berovajî dostayî heye, hevûdû dana jiyandin heye, li hevûdû xwedî derketin heye û li beramberî hevûdû berpirsyartî heye. Ev jî feraset û zîhnîyeta civaka exlaqî û polîtîk a demokratîk bixwe ye.

Di gerdûnê de her zindî xwedî mafê parastinê ye. Heta parastin mafekî xwezayî ye. Mirov jî yek ji cureyê zindiyên xwezayê ye. Her zindî xwe bi pergalekê diparêze. Rêber Apo di derbarê vê mijarê de wiha dibêje; "Gulek ji bo xwe biparêze stiriyê xwe hene." Di vê wateyê de gul jî xwe bi stiriyê xwe diparêze. Di xwezayê de her heywan an jî nebat, hinek bi bêhnê, hinek bi hîs, hinek bi qiloç, hinek bi hêz û her wiha mirov jî bi aqilê xwe xwedî pergala parastinê ye. Rêber Apo jî got, 'mirov gerdûna biçûk e', di vê wateyê de çawa hemû zindî xwe di pergala gerdûnê de diparêzin mirov jî bi aqilê pergala xwe yî gerdûnî dikare hêza parastina xwe nîşan bide. Di heman demê de mirov di dema xwezaya civakî de wekî fîzîk zindiyê herî lewaz e. Ji ber hêza mirov wekî ya şêr û gur nabe yek. Lewma ev lawaziya di mirov de dibe sedemê ku her lêgerîna tekoşîna xweparastinê pê re pêşkeve.

**Li ku derê mirov hebe li wê derê parastin heye**

Di vê wateyê de, parastin bi çêbûna mirovahiyê re derketiye holê. Li ku derê mirov hebe li wê de parastin jî heye. Lê parastin li gorî dem û cih diguhere. Ji ber mirov ruxmê hemû astengiyan jî neçar e hebûna xwe ya jiyanî, aborî, civakî û polîtîk bi parastinê bidomîne. Eger ev nebe nikare jiyaneke serbixwe û azad bidestxe. Ji ber vê yekê bingehê parastinê, aboriya serbixwe ye. Her kom an jî civak berî her tiştî divê çavkaniya pêdiviyên maddî û manewî peyda bike. Civaka xwe nespêre çavkaniya aboriya serbixwe, nikare li beramberî êrîş û xeteriyan hebûna xwe li ser pîyan bihêle. Di dîrokê de ji klan û eşîran heta etnîsîteyan yanî rêveberiya serbixwe ya heremî tekiliyê bi axê re, bi çand û çandiniyê re û bi xwedîkirina heywanan bê ku mihtacî kesî bibin têra xwe kirine. Tekiliyê bi axê re reha dilê jiyana mirov lêdixe. Şewqa jiyana azad ji vir dipişkive û ji vê de şewq dide. Ev, di civakan de baweriya hêza cehwerî pêşdixe. Êdî ji xwe bawer dibin, vîna xwe dibînin, hêvî û bendewariyê wan ji wan çêdibin. Ev xalekî gelek girîng e. Lewma dewlet-netew bi salan e tekiliya civakê ji ax, çand û çandiniyê biriye. Gund bêwate kirine, herkesî ji gunda didin revandin û dikişînin bajaran. An jî ji ked û berhemdayînê qut dikin û dikin koleyê diravan. Bi vê yeke vîna gel dişikînin, ji xwe bêbawer dixin û pê re bi xwe ve girêdidin. Niha jî

hem dewleta Iraq'ê û hem jî PDK'ê herî zêde vî şêwazî wekî sê çekên kîmyewî li hemberî civaka me ya Êzîdî bikaranîne û bikartînin. Yek; tirs, du; dirav. Di esasê vê de jî ji xwe bêbawer xistin û hêviyê wan bixwe ve girêdan heye. Ev jî tê wateya tinebûn û ziwabûna rehê jiyanê.

**Yek ji sedemên parastinê bawerî ye**

Di vê wateyê de bingeha xwe parastinê, berî her tiştî bi aboriyê re zanîst û hêza xwebûnê ye. Dema mirov xwe nas bike, koka xwe nas bike, çanda xwe nas bike, dîroka xwe nas bike wê pêşeroja xwe jî li ser esasê xweparastinê ava bike. Klan û qebîle ruhê parastinê bi tekiliyê komîn û koman ve pêşdixe. Vê yekê ger bi pîrozkirina Totem, ger bi pîrozkirina heywanekî û ger bi pîrozkirina stêrk, heyv û rojê baweriyê xurt dike. Her klanek baweriya xwe bi remzekê tîne. Bi rêya baweriyê girêdaneke manewî ya hevbeş di endamê klanan de ava dike. Yek ji sedemê parastinê jî bawerî ye. Ji ber ku bawerî nirxê civakê yê hevbeş temsîl dike. Ya rastî bawerî yekîtî, şêwr, bi hevre tevgerbûn û zanebûna civakî ya navxweyî pêşdixe. Ev rastî her çiqasî têra êrîşên ji derve neke jî bingehekî sereke li dijî xeteriya ji derve ava dike. Dîrok di vê wateyê de bi tecrube û mînakan têr û tije ye. Gava em di vê wateyê de dîroka civaka xwe ya Êzîdî di ber çavan re derbas dikin; dibînin ku ti kom, hindikayî û gel bi qasî baweriya Êzîdxanê xurt nîne. Lê ji ber hêzeke xwe ya rêxistinî û pergaleke xwe ya parastinê nîne, her bi zorê ji cihê xwe bûye, koçber bûye, hatiye kuştin û her wiha gelek êş û jan kişandiye.

**Li ku derê mirov hebe, li wê derê parastin jî heye. Di vê wateyê de her êrîş di hinavê xwe de feraseta parastinê jî dihewîne. Êrîş nebe parastin jî nîne. Ji ber îro li her derê êrîş heye, li her derê şer û pevçûn jî heye.**

Li cihekî êrîş hebe, li wê derê parastin jî heye. Di vê wateyê de her êrîş di hinavê xwe de feraseta parastinê jî dihewîne. Êrîş nebe parastin jî nîne. Ji ber îro li her derê êrîş heye, li her derê şer û pevçûn jî heye. Zîhnîyeteke xerab dinyayeke xerab e, dinyayeke xerab jî şer û pevçûn e. Lê wekî di dîrokê de jî hatiye dîtin, her zîhnîyeteke xerab bi zîhnîyeteke baş hatiye bidawîkirin. Ji ber ku her êrîş bi destê zorê mal û milkên gelan desteserkirine. Wekî ji vê jî tê fahmkirin bingeha





êrîşan jî zor bixwe ye. Bingeha zorê jî mulkîyet bixwe ye. Bingeha mulkiyetê jî ezezîtî ye. Di vê wateyê de gava em, koka zîhnîyeta êrîşan bikolin, dikarin wiha birêz bikin; ezezîtî mulkiyetê, mulkiyet zorê, zor êrîşan, êrîş desteserkirinê, desteserkirin jî wêranî û talankirinê bixwe re tîne. Eger mirov ne dijminê mirov be, wê êrîş jî çênebe. Eger di nav însanan de aşitî, yekîtî, hevsengî, azadî hebûya pêwîstî bi parastinê jî nedibû. Lê ev ruh û zîhnîyet ji aliyê pergala modernîta kapîtalîzmê hedef hatiye girtin. Bi taybetî eger em sedsala 17'mîn, 18'mîn û 19'mîn de yanî 300 salên dawî di ber çavan re derbas dikin hem li Rojhilata navîn û hem jî li cîhanê bi desthilatdariya hêzên hegemonîk ve kom û hindikayiyên wekî Êzîdî, Suryanî, Keldanî, Ermenî û bi qirkirina sîyasî û desteserkirinê re rû bi rû mane. Ev kom û hindikayî bi êrîşên tevkûjî, koçberî û wêrankirinê ji hev belavkirine. Tenê ji bo tine nebin berxwedan û tekoşînek bêhempa dane nîşandan û heta îro karîbûne hebûna xwe biparêzin.

**Parastin rêxistin e, rêxistin parastin e!**

Gava em di çarçoveya êrîş û parastinê de civaka me ya Êzîdxanê bigirin dest bi rastiyeke pir cûda re em rû bi rû dimînin. Ev rastî mirov di gelek aliyan de dide fikirandin, gelo çima civaka ku di 74 ferman-an re derbas bûye bê parastin maye? Û her wiha gava mirov van pirsan dixe ber lêpirsînê du xalên esasî yên ku civaka me ya Êzîdî xwestiye lawaziya xweparastinê pê derbas bike derdikevin pêşberî me. Yekem; parastina baweriyê, Duyem; hejmar zêdekirin! Di serdema modernîta kapîtalîzmê de ku êrîşên manewî, bawerî, paşeroj û nirxên hevbeş dike, tenê bawerî û zêdekirina hejmarê nikare rê li ber êrîşan bigire. Berî her tiştî wekî ku Rêber Apo dibêje; "Li Kurdistanê pelek jî bêrêxistin naheje." Ev tesbît heqîqetekê radixe ber çavan ku divê wekî nan û av em li ser rêxistinbûnê rawestin. Pirsgirêka xwe parastinê pirsgirêka xwerêxistinkirinê ye. Yanî rêxistin parastin e, parastin rêxistin e. Wê wextê xwerêxistinkirin çî ye? xala herî sereke welatparêzî ye, hezkirina axê ye, girêdana welat e, zanebûna dîrokî ye, yekîtiya civakî ye û pergala xwe parastinê ye.

Niha dewleta Iraqê û PDK'ê parastina malbatî derdixin pêş. Helbûkî ne mimkûn e ku parastina malbatî bêyî paras-

**rêxistin parastin e, parastin rêxistin e. Wê wextê xwerêxistinkirin çî ye? xala herî sereke welatparêzî ye, hezkirina axê ye, girêdana welat e, zanebûna dîrokî ye, yekîtiya civakî ye û pergala xwe parastinê ye.**

tina civakî pêşbikeve. Ev feraset pir şaş û xeter e. Ji ber tenê parastina malbatî jihevxistina civakî ye. Lewma pêwîst e parastina malbatî di parastina civaka xwe de û parastina civakî jî di parastina xaka Şengalê de bibîne. Di dîrokê de jî bi sedan salan malbatan parastina xwe bi eşîrên xwe re, eşîr jî parastina xwe bi yekîtiya eşîran re pêş xistine. Lewma di vê serdemê de, rêya azadiya gelan di rêya parastina civakî re derbas dibe. Wê wextê hestên azadiyê bi xwe re hestên parastinê jî ava dike. Di vê wateyê de parastin û azadî yekîtiya malbat û eşîran e. Îro malbat û eşîrên Êzîdxanê ji yekîtî bêtir belavbûnekê dijîn. Ji ber vê sedemê gelê me yê Êzîdxanê bi 74 fermanan berdelên gelekî giran daye. Ji bo xwe ji fermana biparêze neçar e bi tevlêbûna Rêveberiya Xweser re xwe komî hev bike û ev belavbûna heyî derbas bike.

## Çiyayê Şengalê dostê rojên teng e

Civaka me ya Êzîdî û Çiyayê Şengalê bi êrîş û berxwedanan, wekî rehê xwe li hev bibêçin xwe li hev pêçane. Wekî darê bi rehê xwe ve sitewiyayî, bi hev re sitewiyane. Di vê wateyê de, têgîna Kurd, çiya û parastin şêweyê felsefa jiyana azad e. Kengî êrîş li ser wan çêbûye berê xwe dane çiya û çiya jî hembêza xwe ji wan re vekiriye. Kom bi kom, malbat bi malbat tevî çîrokên xwe hatine Çiyayê Şengalê. Ji bo azad bijîn, xwe ji fermanan biparêzin û hebûna xwe berdewam bikin hatine... Ji ber çiya dostê rojên teng e. Sedam Huseyîn ji bo rehên dostên lihevpêçayî qut bike bi feraseta nijadperestî, dewletperestî û desthilatdarî êrîş kiriye. Her êrîşekî bi fermana tinekirin û qirkirinê destpêkiri ye. Dîroka berxwedana Çiyayê Şengalê li ser çîrokên heyî çîrokên nû zêdekirine. Niha binê Çiyayê Şengalê ji kun û ji şikeftan wekî kunê seradê ye. Her kun û şikeftek stargehek e, xwedî çîrokek e. Gava çavê bi tirs noqî wan dîwaran dibûn, çîrok û hafiza fermanên meşa ber bi Çiyayê Şengalê ve, zor û zahmetiyên mezin ku kişandine zindî dibûn. Jixwe hestên bi tirsê distewin di hafiza mirov de her zindî ne. Di vê meşa bêserûbinî de xizantî, birçîbûn, tîbûn heye û heta gelek ji wan jiyana xwe ji dest dane. Lê meşekî ku hêviya parastina baweriya pêşerojê tê de xurt bû dîtine. Lewma Çiyayê Şengalê ji bo parastin û baweriya civaka me ya Êzîdî pîroz e. Civaka Êzidî ruhê xwe bi baweriyê û bawerî jî bi Çiyayê Şengalê re parastine. Sedam Huseyîn ev çîya ji civaka Êzidî re zêde dîtiye û di sala 1975'an de ew ji Çiyayê Şengalê bi darê zorê daxistine deştê. Piştî wan dadixe deştê, mal û milkê wan dişewitîne. Xwezî zimanê Çiyayê Şengalê hebûya û behsa wan kêliyan



bikira. Armanca ku ew ji çiya daxistina deştê, qutkirina rehê berxwedan û xweparastina civaka Êzidî û teslîmgirtina wan e. Çiya çawa çeper e, deşt jî ewqasî bêçeper e. Yanî hedef ne çeper e, hedef mirov bixwe ye. Ji ber li deştê çepera ku mirov tê de şer bike û xwe tê de biparêze nîne. Wekî di fermana 3'ê Tebaxa 2014'an de ku DAÎŞ'ê raste rast bi êrîşê deştê kirin, civaka me ya Êzîdî neçar ma ku çareyê di revê de bibînin. Ji ber ku li deştê ne kevirekî xwe bidin ber û ne jî çekekî pê şer bikin di destê wan de hebû. Heta ber bi Çiyayê Şengalê ve hilkişiyan, bi hezaran hatin kuştin, dîl ketin û her wiha derfetê xweparastinê nedîtin. Ew dîmen hîn di hefiza me teva de zindî ye.

Armanca DAÎŞ'ê qelandina koka civaka Êzidî bû. Lê gerîlayên azadiyê bi komeke biçûk pêşiya vê kok qelandinê girtin. Bifikirin bi hezaran ciwanên Êzîdxanê hene, lê ji ber ne xwedî pergaleke xweparastinê ne xelasiya xwe di revê de dibînin. Ev rev hîn bêtir DAÎŞ'ê bi cesaret dike, har û dîn dike û êrîşkar dike. Nimûne, rast e komeke gerîlayên azadiyê ya biçûk hebû, lê xwedî pergalekê parastinê ya mezin bûn. Eger mîna koma gerîla komek ciwanên Êzîdxanê jî xwedî heman tecrubê bûna wê DAÎŞ'ê ewqasî bilez pêş ve neçûya. Teqez wê pêşiya wan bigirtana û ewqasî jin, zarok û Êzîdî neketibana destê çeteyan. Bifikirin, hinekan dayikên xwe li şûna xwe hiştibûn û bazda bûn. Civaka ku nikaribe dayika xwe ji fermanê xelas bike ew civak mirina herî kûr dijî. Ji ber vê heqîqetê civaka Êzîdî jî wekî her civakekê neçar e pergala xwe ya parastinê ava bike. Eger pergala parastinê xwe nespêre hêza xwe cehwerî wê nikaribe li beramberî êrîşan îrade nîşan bide. Parastina yekemîn zîhnîyet e, ya duyemîn çîya ye, ya sêyemîn çek e û ya çaremîn şerkirin e. Rêveberiya Xweser a Şengalê xwedî van hemû derfetan e.

**Eger parastina cewherî nebe ferman heye**

Di Fermana 3'ê Tebaxa 2014'an de civaka me ya Êzîdî bawer nedikir 12 hezar pêşmergeyên PDK'ê ew di nav lepê DAÎŞ'ê de berdin û bazdin. Ev jî bû dersek, eger civakek xwedî hêza xwe cehwerî ya parastinê nebe û xwe ji fermana neparêze, wekî heman fermanê wê di bin êrîşan de biperçiqe û bi komkujiyê re rû bi rû bimîne. Ji ber vê yekê piştî fermanê pêwîstî bi rêxistinkirina YBŞ-YBJ'ê û pergala Rêveberiya Xweser hate dîtin. Rêveberiya Xweser pêwîst e bi qasî parastina zîhnî parastina cewherî jî pêş bixe. Ji fermana

**Peymana 9'ê Cotmehê di esas de tinekirina hebûn û îradeya parastina Şengalê bû. Bi taybetî çima Asayîşa Êzîdxanê kirin hedef? Ji ber ku Asayiş hêzeke parastina civakî bû. Armanc civakê bêparastin hiştin bû.**



2014'an heya niha ked û hewldaneke mezin hate nîşandan. Bi taybetî yên ku pêşengî ji vê hewldanê re kirin, Şehîd Mam Zekî, Şehîd Seîd, Şehîd Zerdeşt, Şehîd Dijwar, Şehîd Egîd, Şehîd Dilşêr û her. wiha bi sedan ciwanên Êzîdî û gerîlayên azadiyê bi ruhekî fedayî û bi destaneke dîrokî bingehek ava kirin. Di encama vê berdêla giranbuha de, îro Rêveberiya Xweser bi sazî û dezgehên xwe pêşketineke pir cidî di aliyê sîyasî, leşkerî û rêxistinbûnê de bidestxistiye. Cara yekemin e ku civaka me ya Êzîdî rêxistineke navxweyî û hêzeke hundirîn ava dike. Di vê pêvajoyê de, pêşketin û guhertinên mezin jî çêbûne. Ev kêfxweşî û dilşadiyeke mezin e.

Piştî ku YBŞ-YJŞ'ê rehê zanebûna xweparastinê berdan nava tevahî civakê, ev metirsiyeke mezin di dewleta Tirk, PDK û Iraqê de ava kir. Lewma ev fikar û metirsî bingeha Peymana 9'ê Cotmehê danî. Peymana 9'ê Cotmehê di esas de tinekirina hebûn û îradeya parastina Şengalê bû. Bi taybetî çima Asayîşa Êzîdxanê kirin hedef? Ji ber ku Asayiş hêzeke parastina civakî bû. Armanc civakê bêparastin hiştin bû. Lê helwest û berxwedana civaka me ya Êzîdî ev peyman pûç kir. Lê ev nayê wê wateyê ku em bi temamî bêjin xeteriya Peymana 9'ê Cotmehê rabûye. Lê mirov dikare vê xeteriyê bi zanebûn û rêxistinkirina cehwerî bêwate bike. Nimûne dema artêşa Iraqê êrîşî Asayişa Êzîdxanê dike, gel li berxwe dide û li pêşiya êrîşan radiweste, fermandarekî artêşê ji leşlerekî Êzidî re wiha dibêje; "Êzîdî çiqas





guherîne, berê du leşker serê hemû Êzidiyan biperçiqanda jî yekî newêrîbû dengê xwe derxista. Lê niha em bi tank û hêzeke mezin hatine jî nikarin bi wan." Wekî ji vê mînakê jî tê fahmkirin civakeke rêxistinkirî dikare xwe ji her cure êrîşên derve biparêze.

Gava em parastinê di çarçoveya zîhnîyet û şêweyê pergala kapîtalîzmê de digirin dest, guhertinên berbiçav ên herî xeter dibînin. Wê çaxê ev şêweyê xeternak çi ne? Bi rêya teknîk û zanistê êrîşî tevahiya nirxên civakê dike, wekî çand, huner, ziman, dîrok, aborî, sîyasî û erdnîgarî. Pergala modernîta kapîtalîzmê ku ji bilî çîn, dewlet û serweriya xwe ti kesî nas nake, her cure şêwazî bikartîne û hebûna nijad, gel û civakan di nava xwe de dihelîne, belav dike û difelişîne. Ya rastî civak hebûna xwe bi çi heyî dike û bi çi diparêze, wê hedef digire. Dîyardeya ku bingeha nasnameya civakî îfade dike, tevahî bi xeyalê pêşeroja cîhanî di mejî û fikir de ditevizîne. Vê jî bi jibîrkirina hafiza dîrokî, bi nenaskirina heqîqeta koka civakî û bi helandina jin û ciwanan dike. Ev jî bi xwe re, pêwîstî bi avakirina pergala xweparastinê ferz dike. Di vê wateyê de divê em jî wekî Şengal li beramberî vê rastiyê hê bêtir xwe bi hafiza dîrokî, bi naskirina heqîqeta koka civakî û bi perwerdekirina jin û ciwanan bigihijînin asta xwebûna ku hebûna me dixuliqîne. Ji bo em bersiva fermanan bidin, dil û mejiyê xwe bi Rêveberiya Xweser re bikin yek hêz, yek deng, yek reng û yek îrade. Asta têgihiştina wê asta serkeftina wê dîyar dike. Bi vê zanebûnê divê em destpêkê xwe, malbata xwe, cîranê xwe û bi civaka xwe re di nava yekbûneke tekoşîn û berxwedanê de tevbigerin.

Eger em bi xwe bawer bin, bi hêza xwe bawer bin û ji xwe hêvîdar bin tiştekî em bisernexin nîne. Bawerî hêz û serkeftin e, hêvî moral û şadîbûn e. Ev derfet jî di destê me de heye, tenê em bi zanebûna parastinê xwe birêxistin bikin û pêşeroja xwe azad bikin.

# Xwe Ji Fermanê Biparêze





Êzdîn Şengalî

Bi hezaran salan e ku şûrê fermanê li ser serê Êzidiyan her li ba ye. Li hemberî vê jî civaka Êzidî û Êzdayetî bi hezaran salan e li deşt û çiya, li gund û bajaran li ber xwe dide. Em dikarin bêjin ku di dîrokê de berxwedana herî demdirêj a li hemberî ferman, talan û qirkirinê, berxwedana civaka Êzidî ye. Fermanên li ser Êzidiyan ne tenê bi Îslamiyetê re, bi ferzkirina misilmantiyê re destpê kiriye. Rast e, fermanên herî giran di serdema Îslamiyetê de li hemberî Êzidiyan û Êzdayetiyê pêş ketine lê beriya Îslamiyetê jî li ser qebîle, êl û eşîrên Êzidiyan şer û êrîş çêbûne. Rêber Apo gotibû, "Berxwedana Êzidiyan û Çiyayê Şengalê 5000 hezar sal in berdewam dike." Em civaka Êzidî 5000 hezar sal in li hemberî dewlet û desthilatdariyê, li hemberî koletî û xulamtiyê li ber xwe didin. Lazim e em dîroka ferman-an û dîroka berxwedanê baş nas bikin ku em karibin roja me ya îro jî êrîşên li ser bîr û baweriya xwe, çand û civaka xwe fam bikin û berxwedana xwe berdewam bikin. Sedem û çavkaniya van hemû êrîşan ew e ku Êzidî û Êzdayetî çanda kok a civakê ne, çanda kok a mirovahiyê ne. Dewlet û desthilatdarî ji bo karibin qebîle, êl, eşîr û qewman bikin kole herî zêde êrîşî çanda civakê kirine. Di dîrokê de dema dewlet û desthilatdarî pêş ket, beriya her tiştî berê xwe da qebîle, eşîr û qewmên azad. Hin ji van qebîle û eşîran nekarîn li ber xwe bidin û şikestin, hin

ji wan jî koletî û xulamtiyê qebûl kirin û ketin xizmeta celadên xwe. Lê civaka Êzidî bi bîr û baweriya xwe, bi çanda xwe li hemberî hemû hêzên desthilatdariyê sekinî. Dest ji baweriya xwe berneda. Ji ber vê rastiyê ye ku 5000 sal in ferman û talan ji ser serê Êzidiyan kêm nabin. Bi hezaran salan e ku Êzidî hem bîr û baweriya xwe ya pîroz diparêzin, ser didin lê sir nadin û di heman demê de çanda civakî ya hemû mirovahiyê diparêzin. Ji ber vê heqîqetê ye ku mohra fermanê herdem di destê hemû dewlet û Împaratoriyan de bûye.

**Ferman ew e ku tu bi her tiştê xwe ve tune bibî**

Di Êzdayetiyê de ax pîroz e, av pîroz e , dar pîroz e, roj, agir, heyv û stêrk pîroz in. Eger ev pîrozî nebin, ne jiyan dimîne ne jî civak. Ji ber vê heqîqetê, civaka Êzidî hemû tiştên pîroz ên jiyanê, xwezayê û civakê parastine. Di serdema Îslamiyetê û bi taybet di dema Împaratoriya Osmaniyan de ev êrîşên li ser civaka Êzidî êdî bûne ferman. Ferman çi ye? Ferman ne şerê dewletan e, ferman ne şerê êl û eşîran e, ferman ne şerê qewman e.



Ferman qirkirin e, tunekirina kokê ye. Armanca fermanê ew e ku kok were qelandin. Ji xwe dema Osmaniyan li ser serê Êzidiyan ferman radikirin, digotin 'Kit ji wan nehêlin." Armanca fermanê ne ew e ku şerekî biqewime û dest deynî ser mal û milkên xelkê, rast e ev jî heye lê navê vê talan e. Ferman ew e ku ji te, ji bîr û baweriya te, ji dîn û diyaneta te, ji cih û warê te, ji qube û silavgehên te, ji çem û rûbarên te, heta karxezalên te, tiştek ji te nemîne. Tu bi her tiştê xwe ve tune bibî. Lazim e em ferqa fermanan ji şer û pevçûnan bibînin û li gor wê heqîqete xwe biparêzin.

**Çanda Êzdayetiyê çanda berxwedanê ye**

Civaka Êzidî di dîroka xwe de carekî jî serê xwe li ber fermanan netewandiye. Ji Deşta Wêranşarê heya Çiyayê Zagrosan, ji Deşta Nînowayê heya Çiyayê Şengalê her li ber xwe daye. Di rastiyê de, çanda Êzdayetiyê çandeke mezin a berxwedanê ye. Çi demî êrîş li ser wan çêbûye, Êzidî li hev kom bûne, di bin darên pîroz, şikeft û geliyên asê de şêwra xwe kirine, biryara berxwedanê dane û bi dehan caran artêşa Osmanî şikandine. Carna jî neçar mane û ketine ser reya koçberiyê, li cîhanê belav bûne lê car din

**. Ferman ew e ku ji te, ji bîr û baweriya te, ji dîn û diyaneta te, ji cih û warê te, ji qube û silavgehên te, ji çem û rûbarên te, heta karxezalên te, tiştek ji te nemîne. Tu bi her tiştê xwe ve tune bibî. Lazim e em ferqa fermanan ji şer û pevçûnan bibînin û li gor wê heqîqete xwe biparêzin.**

berxwedanê de merheleyeke nû ye. Lazim e em civaka Êzidî vê merheleya nû baş nas bikin, fam bikin. Dijminên Êzdayetiyê, dixwestin bi vê fermanê re derba dawî, derba mirinê li me bixin. Dixwestin navê Êzidiyan, heqîqeta Êzdayetiyê ji kokê ve tune bikin. Dixwestin keleh û stargeha pîroz a Êzidiyan, Çiyayê Şengalê bişkînin. Ji bo vê, hemû dijminên Êzidiyan bû yek. Di dîroka Êzidiyan de cara ewil bû ku gelek dewlet û hêz ji bo FERMANA REŞ ketibûn nav tifaqê. Ev di dîroka fermanan de tiştekî nû bû. Ji ber vê jî, fermana herî giran bi serê Êzidiyan ve hat. vegeriyane û li hev kom bûne. Ev heqîqeta bi hezaran salan e û roja me jî berdewam dike. Hemû qebîle û eşîrên civaka Êzidî li ber xwe dane. Wê demê, artêş an jî hêzên leşkerî yên Êzidiyan tunebû. Qebîle li ber xwe didan, eşîr dibûn yek û li ber xwe didan. Yanî hemû civak li hemberî fermanan li ber xwe dida. Xort, kalemêr, jin, zarok hemû civaka Êzidî parastina Êzdayetiyê dikirin. Di dîrokê de, civaka Êzidî tu caran parastina xwe ji kesekî re nehiştiye. Gotineke Pêşiyan heye, dibêje: “Çavê li deriya xwelî li seriya.” Civaka Êzidî bi hezaran sal di ferqa vê rastiyê de bû. Ne ji Osmaniyan, ne ji Safewiyan hêviya parastinê kirin. Ma însan dikare parastina xwe ji celadê xwe re bihêle? Ma em dikarin berxê bikin devê gurî? Ma çawa dibe dijmin û xwêrnexwazên Êzidiyan, parastina Êzdayetiyê bikin? Ji ber vê heqîqetê civaka Êzidî bi sedhezaran şehîd dane lê ol, çand û baweriya xwe, bi xwe parastine. Fermana 2014’an merheleyeke nû ya berxwedanê ye

Fermana 3.8.2014 ku bi destê DAÎŞ’ê pêk hat, hem di dîroka fermanan de û hem jî di dîroka Lazim e em vê rastiyê baş bibinin û nas bikin. Ji bo rûmet û kerameta me bişkînin her tiştî anîn serê me. Rast e li hemberî vê fermanê jî me li ber xwe da lê me berdelên herî giran a dîroka xwe dan. Çima ev fermana talî bi ser serê me ve ewqas giran hat? Lazim e em bersiva vê pirse jî rast bidin.

Ya yekem; ruxmê ku me dengê lingê Fermanê bihîst jî em dereng ketin nav liv û tevgerê û me amadekariyên parastinê nekir. Sedem ew bû ku me parastina xwe ji pêşmergeyên PDK’ê û artêşa Iraqê re hişt. Di dîroka Êzidiyan de me tu carî parastina xwe ji kesî re nehiştiye. Lê di Fermana 2014’an de em ketin nav hêviya ku ewê PDK û artêşa Iraqê parastina me bikin. Wisa lê hat ku, dema pêşmergeyên PDK’ê mal bi mal geriyan û sîlehên me kom kirin, me ferq nekir ku ewê çi bi serê me ve were. Heya kêliya fermanê jî em li bendê bûn ku pêşmerge û artêşa Iraqê xwe bigihînin hawara me. Eger me parastina xwe nehişta bextê tu kesî û me amadekariya xwe bikira, ev ferman ewqas giran bi ser me ve nedihat. Lazim e em vê rastiyê baş bibînin. Lê di dema Osmaniyan de, me para-

**. Heya kêliya fermanê jî em li bendê bûn ku pêşmerge û artêşa Iraqê xwe bigihînin hawara me. Eger me parastina xwe nehişta bextê tu kesî û me amadekariya xwe bikira, ev ferman ewqas giran bi ser me ve nedihat. Lazim e em vê rastiyê baş bibînin.**

stina xwe ji tu kesî hêvî nedikir. Em bi xwe bûn. Me şêwra xwe dikir, biryara berxwedanê dida, çek û cebilxaneyên xwe hazir dikir, pêşengên berxwedanê diyar dikir û herkes parastina xwe dikir. Ji ber em ji vê rastiya xwe dûr ketin, me berdêlên giran dan.

**Lazim e civak xwedî li parastina xwe derkeve**

Di wê fermana giran de hêzên gerilayên azadiyê, şagirtên Rêber Apo xwe gihandin Şengalê û rewş guherî. Em bînin bîra xwe, ne ku tenê gerîla li ber xwe da. Bi hatina gerîla ve bi sedan keç û xortên



Êzidî çek rakirin, tevlî parastina Şengalê bûn û dijmin wisa şikest. Eger tenê gerîla li ber xwe bidana ewê têr nekira. Lazim e civak bi xwe xwedî li parastina xwe derkeve, xwe perwerde û birêxistin bike û rê li ber fermanan bigire. Ruxmê hemû êşên giran, fermana 2014'an di dîroka Êzidiyan de rûpeleke nû jî wekir. Ji bo parastin û rizgarkirina Şengalê hêzên parastina cewherî hatin avakirin. Ev di dîroaka me ya berxwedanê de merheleyeke nû ye. Rast e, bi hezaran salan e ku em li ber xwe didin. Wekî qebîle, wekî eşîr, wekî civak me her li ber xwe daye. Lê me di dîroka xwe de tu carî hêzeke parastinê, hêzeke fedayî ya ji bo Êzdîxanê ava nekiribû. Eger me ev hêz ava nekira, me ne dikarî Şengalê biparêzin ne jî Şengalê rizgar bikin. Asayîşa Êzdîxanê, hêzên YBŞ-YJŞ'ê stûna Êzdîxanê, parezvanên Çiyayê Şengalê ne.

Dibe ku hin kes û hêz bêjin, "Me ferman derbas kir, me DAÎŞ şikand û Şengalê rizgar kir, Dinya bi Êzidiyan hesiya û loma êdî me hêzên parastinê navê." Ji xwe hin alî ji niha ve hebûna hêzên parastinê dixwazin bixin nîqaşê. Di bin navê 'hêzên ne yasayî' de dixwazin hêzên me yên parastinê ji hev belav bikin, dijminên me ji me re dibêjin "Werin stargeha we em in, em ê we ji ber hemû êrîşan biparêzin." Hin kes bi zanebûn vê nîqaşê dikin hin kes ji nezanînê. Lê lazim e em baş fambikin, yên van peyvan dibêjin ne xwêrxwazên me ne. Ma ne ev hêz bûn ku fermana 2014'an anîn serê me. Emê çawa careke din



baweriya xwe bi wan bînin, hêzên xwe yên parastinê tune bikin, xwe bê parastin bihêlin. Me divê ji her demê zêdetir hêza xwe ya parastinê mezin bikin. Çima? Ka em berê xwe bidin Iraqê, Rojhilata Navîn û hemû cîhanê. Her der di nav agirê şer de ye. Her roj dewletek êrîşî dewleteke din, rêxistinek êrîşî rêxistineke din dike. Dijminên Êzdayetiyê jî wekî nêçîrvanan li dora me digerin, dixwazin me bixin xefikê, dixwazin nêçîra me bikin. Wa rewşa Iraqê, ne xuya ye ku wê sibe çi biqewime. Her roj li ser Şengalê êrîşên qirkirinê têne kirin. Dijminên Êzidiyan wekî guran li dora me digerin. Rast e, me bi berdêlên giran rê li ber fermana 2014'an girt lê şûrê fermanê hê jî li ser serê me ye, me divê em vê heqîqetê ji bîr nekin, bi her awayî Xwe Ji Fermanan Biparêzin.

**Navê hebûna Êzidiyan Rêveberiya Xweser e**

Di dîroka Êzdîxanê de cara yekem e ku em bûn xwedî nîzameke civakî û siyasî. Êdî em hemû pêdiviyên civaka xwe hewl didin bi xwe çareser bikin. Gelek tiştên ku dewletên mezin nikarin çareser bikin, em dikarin bi hêza xwe ya cewherî çareser bikin. Eger em berê xwe bidin dîroka xwe, civaka Êzidî ji bo zilm û zordariyê bike tu caran dewlet ava nekirine. Em civaka herî qedîm a Rojhilata Navîn in, em ji dewletan qedîmtir in. Bîr û baweriya me ji dewletan qedîmtir e. Me welat hebûye lê dewlet nebûye. Îro jî em bê dewlet in û em dizanin dewlet ji bo zilm û zordariyê heye. Lê welatê me heye, civaka me heye, bîr û baweriya me ya qedîm heye. Emê di nav evçend dewletên hov de çawa hebûna xwe biparêzin, çawa zarokên xwe perwerde bikin, çawa xwe birêve bibin? Bersiva van hemû pirsan Rêveberiya Xweser e. Rast e, em nebûne dewlet û em naxwazin bibin jî lê lazim e em civaka xwe birêve bibin, têkiliya civaka xwe bi hemû dinyayê re çêkin. Loma me nîzameke civakî, siyasî, aborî divê û ew jî Rêveberiya Xweser e. Di sedsala 21'emîn de navê hebûna Êzidiyan, Rêveberiya Xweser e. Civaka Êzidî encax bi vê nîzamê dikare hebûna xwe biparêze û pêş bixe. Ji ber vê heqîqetê, lazim e em li dora vê nîzamê ji her demê zêdetir kom bibin, nizama xwe xurt û mezin bikin.

**Êrîşên li ser civaka Êzidî ne tenê êrîşên leşkerî ne, jê zêdetir êrîşên çandî, siyasî, civakî û aborî hene.**

Ne tenê şûrê Fermana Reş li ser serê me ye, roja me ya îro, êrîşên li ser me zêdetir yên Fermana Spî ne, êrîşên qirkirina çandî ye. Loma lazim e em Fermana Spî û Şerê Taybet jî baş nas bikin, li hemberî van êrîşan berxwedana çandî pêş




bixin. Di roja me ya îro de tenê bi parastina leşkerî tu civak nikare hebûna xwe biparêze, civaka Êzidî hîç nikare. Ji ber ku em civaka bîr û baweriyê ne, em bi çanda xwe hebûna xwe diparêzin. Roja ku bîr û baweriya me, rê û resmên me, çand û hunera me ji destê me çû em nema dikarin hebûna xwe biparêzin. Ji bi em Xwe Ji Fermanan Biparêzin, herî zede jî lazim e em berxwedana çandî bilind bikin. Ji bo vê jî lazim e em polîtîkayên qirkirina çandî û şerê taybet a li ser civaka me tê meşandin baş nas bikin. Em dikarin di çarçoveya parastina civakê de gelek xalên din bînin ser ziman. Lê ya girîng ew e ku em zanibin êrîşên li ser civaka Êzidî, êrîşên qirkirinê berdewam dikin. Ji Fermana Reş heya Fermana Spî, dijminên Êzdayetiyê dixwazin hebûna me tune bikin. Rast e, me li hemberî fermana 2014'an li ber xwe da û me rê li ber tunebûna Êzdayetiyê girt. Me hebûna xwe parast. Lê îro roj, êrîşên li ser Êzidiyan, êrîşên li ser Şengalê ji sala 2014'an girantir e. Di fermana 2014'an de xwestin me bi carekî tune bikin. Lê îro, bi rê û rêbazên cûda, hêdî hêdî dixwazin me bihelînin, civaka me parçe bikin û fermanê temam bikin. Peymana 9'ê Cotmehê ji bo vê ye. Wekî din gelek b azariyên qirêj li ser sere me tê meşandin, şûrê fermanê hê jî li ser sere me digerînin. Ji ber van rastiyan, eger em dixwazin hebûna xwe biparêzin lazim e em Xwe Ji Fermanê Biparêzin. Eger em hemû civaka Êzidî, ji hêzên parastinê heya sazî û dezgehên Rêveberiya Xweser bi yek fikrî û yekdestî li dijî van êrîşan bisekinin, emê biserkevin. Ewê civaka Êzidî karibe li Iraqê jî, li Rojhilata Navîn jî li hemû cîhanê jî wekî civakeke azad hebûna xwe berdewam bike.

# Dîroka fermanan





Murad Xetarî

**• Fermanên Sedsala 15'emîn ( 1400 -1500)**

**38- Fermana Celaledîn Alamîr ( Sala 1400 ) Di sala 1400'an de**

Celaledîn Alamîr Mîran Şah kurê Teymurlenk, li Mûsilê bi xwîna gelê Mûsilê û gelê hawîrdora wê deverê sor kir, talan û wêran kir.

**39- Fermana Şewitandina Laleşê ( Sala 1409'an )**

El-zergelî got: "Gora Şêx Adî di sala 1409'an de hate şewitandin." Di kitaba El Maqrîzî de jî hat nîvîsandin di vê salê de gora Şêx Adî ya li Hekarî hatiye şewitandin lê nayê zanîn kê û çima şewitand.

**40- Êrîşa Celaledîn Yusif el-Hilwanî ( Sala 1414'an )**

Hatina fermandarekî bi navê Celaledîn Muhamed bin Îzidîn Yusif el-Hilwanî tevî hêzên çekdar ji axa Romê, dest bi fermanekê li ser Êzidiyan li Çiyayê Hekarî kirin. Li gorê xwesteka ilmdarekî şafiî bi navê Celal el-dîn Muhemd, Mîrê Cizîra Botan Îzedîn el-bextî, Mîrê şiranş ya girêdayê Dihokê tugil a Kurdî û Mîrê Keleha Hezqîl Şems el-dîn el-Cerdqelî alîkarî dan Celal el-dîn. Bi hevdû re berê xwe dane Çiyayê Hekarî. Ji bo ku dest bi fermanê bikin û tê gotin ku hejmareke mezin ji civaka Êzidî hatin kuştin û hinek jî dîl hatin girtin. Ew kesên ku dîl girtibûn li ber gora Şêx Adî kom kirin û gor xerakirin û hestîyên wî jî derxistin û şewitandin. Ji wan re jî gotin "ev însanê we yê pîroz ka çima nikarî xwe biparêze.



Her wiha hukimdarê Keleha Heskîfê jî li gel Celaledîn bû û bi hev re dest danîn ser mal û milkê gel. Tê gotin ev cara sêyemîn e ku destdirêjî li ser gora Şêx Adî tê kirin.

**41- Rûxandina Laleşê ( Sala 1415'an )**

Di sala 1415'an de ji aliya siwarên olperest gelek Êzîdî hatin kuştin û disa li pêşberî wan ziyaretê Şêx Adî hat vekirin û hestiyen wî jî dîsa şewitandin.

**42- Êrişa Çerkezên Misrê ( Sala 1448'an )**

Pir êrîş li ser wilayetên Êzîdiyan hebû di milê Bîlad al Şam û Tirkiye jî wekî wilayetên Kilis-Heleb- Qesîr-Antakya hwd. Di sala 1448'an ji aliya Çerkezên Misrê di bin fermandariya Tahir Qanso û hin eşîretên Kurdan wek Qadiriya û Germiyan, êrîş li ser wilayeta Kilis ya Êzîdiyan kirin. Di vê êrîşê de mîrê Êzidiyan (Hebîb) hat kuştin û pê re jî çi li ber çavên wan ket talan û wêran kirin.

**43- Fermana koçberkirina hemû Êzidiyan ji Germiyanê ber bi Musilê ve ( Sala 1451'an )**

Di vê salê de hemû Êzîdî ji Germiyan hatin koçberkirin û li dora Musilê hatin bicihkirin.

**44- Fermana Uzun Hesan Qere Bolok ( Sala 1464'an )**

Ji rêveberên eyla tirka (Akkoyunlu) yek bi navê Uzun Hesan Qere Bolok li Heskîfê êrîşê Êzîdiyan kir. Hijmarekî gelek mezin ji wan hate kuştin. Ev êrîş pir dijwar bû heya astekî ku gundekî bi giştî hatin qetil kirin. Artêşa êrîşker di bin fermandariya Xelîl Beg de bû.

**• Fermanên Sedsala 16'emîn ( 1500-1600 )**

**45- Fermana Îbrahîm Xan Di serdema Nadir Qulî de,**

birayê wî waliyê Azarbîcanê Îbrahîm Xan fermandarê artêşekî bû. Ev artêş di bin fermandariya wî de êrîş biribû ser Êzîdiyên Azarbîcanê. Êrîş ji Bilbeasê destpêkir heya bi Miragê û Sildoz ve çûbû. Di



vê êrîşê de hijmarekî mezin ji Êzîdiyan hatin kuştin. Nêzîkê 1500 malbat hatin girtin û her tiştên wan hatin dizîn. Li gorî dîroknasan nêzîkê 18 qebîle li vê herêmê jiyan dikirin. Ji van eşîran jî Mehmudiyan Dunbelan, Buxtî, Bazugî, Bradot, Buşkî, Şikla, Reş, Birav, Mendgî, Şikakî, Dagorî, Şiflî, Nadimî, Şemzikî, Mugrî, Sîcargî, Artuşî, Kerfelî, Zikrî, Dumbelî û hwd. hebûn.

**46-Fermana Mîrê Erdelan li Dijî Hêzên Hisên Begê Dasinî**

Eşîreta Dasiniyan bû armance pir êrîşan, bi taybet di serdema mîrê Kurdan Izedîn el-Bextî ku di dema wî de Mîr Teymûr el-Arecî hakim bû. Dema ku Sultan Suleyman di sala 1534'an de xîlafet girt û bû Sultan, dît ku Izedîn Şêr ku Êzidî bû û waliyê Hewlêrê bû, gotinên wî guhdar nake. Lewma xwest wî bikuje û wîlayete Hewlêrê bide destê Mîr Hisên Begê Dasinî. Di wê deme de herêma ku girêdayî wîlayeta Hewlêrê Misilman jî lê dijîn. Lewma misilmanan qebûl nedikirin ku yekî Êzidî wan birêve bibe. Lewma Mîr Seyfedîn xwe gihand mîrê Erdelanê û alîkarî jê xwest da Mîr Izedîn Şêr bikujin. Lê Mîrê Erdelan daxwaza wî qebûl nekir. Seyfedîn vegeriya Hewlêrê û bi navê cîhadê bang li hemû misilmanan kir ku êrîşê Êzidiyan bikin. Bi hovane êrîşê Hewlêrê kirin û şerekî dijwar qewimî. Tê gotin ku artêşe Dasiniyan şer winda kirin û 500 kes ji hêzên Dasiniyan hatin kuştin. ji bo wê Sultana Osmaniyan bang li Hisên Begê Dasiniyan kir û Hesabê binketinê jê xwest. Di dawiyê de Hisên Beg li astana hat îdam kirin. Hisên Beg Dasinî bû, lê waliyê Şêxan jî bû, lewma kuştina wî ji aliyê Sultan Suleyman Qanunî ve bû sedema nerazîbûna Êzidiyan. Êzidî bi vê hêrsa xwe êrîş birin ser Osmaniyan. Di wê demê de yekem car bû ku Osmanî bi riya bawerî, fermî fetwaya kuştina Êzidiyan dabû.

**47- Êrîşa Ismaîl el Sefewî ( Sala 1507'an )**



Di sala 1507'an de Ismaîl el Sefewî fermanekî li ser Êzîdiyan birêvebir. Êzîdî li hemberî vê êrîşê li berxwedan û hijmarekî mezin ji artêşe Sefewiyan kuştin. Lê artêşe Sefewî warên Êzîdiyan bi taybet Şengal dagirkirin ku wê demê de bin dagirkeriya qizilbaşan de bû. Şerî wî ji 1504'an heya 1509'an berdewam kir.

**48-Êrîşa Biryak Begê Moxolî ( Sala 1508'an )**

Di sala 1508'an de Biryak Begê Moxoliyan êrîşê Êzîdiyan kir. Ji wan pir kes kuştin, cih û warên wan talan kirin.

**49-Fermana Qizil Baş (Al-Sefewî) ( Sala 1516'an )**

Êzîdiyên Şengalê di sala 1516'an de bi hevkariya mislimanên sune, di bin fermandariya Omer Beg û Kerkud Buxten de bi alîkariya bavê al Mewahib kurê Îdrîsê Bidlîsî, şerê qizilbaşan kirin û ji wan nêzî 200 kes kuştin. Piştî kuştina (qerxan) biraye waliyê Amedê, hemû herêmên weke (Aran, Şengal Cermîn, Bîraçek, Mêrdîn) di bin serweriya Êzidiyan de bû.

**50- Êrişa Osmaniyan li ser Îmareta Kîlîsê ( Sala 1516 – 1517'an )**

Osmaniyan xwestin Misrê dagir bikin û hêz ji xwe re kom bikin. Di wê demê de Sultanê Osmaniyan bang li Êzîdiyan kir tevî Amîrê wan Qasim. Wê demê Îmareta Kîlîsê di destê malbata (Şêx Mend el Şemsanî ) de bû. Rusipiyen Êzîdiyan û Amîrê wan Qasim û kurê wî Cenbula çûn Stenbolê bi daxwaza Sultanê Osmaniyan. Di heman demê de amîrê Helebê Qerac Paşa peyam ji Sultan re şand û jê xwest Êzîdiyan bikuje. Sultanê Osmaniyan xiyanet li mêvanên xwe kir û hemû tev amîrê wan Qasim kuşt.

**51-Êrîşa Hesan Kurê Seyfedîn Mîrê Amêdiyê ( Sala 1534' an )**

Hesan kurê Seyfedîn Mîrê Amêdiyê, sala 1534'an fermandariya fermanekî li Îmareta (desîn) Dihok kir. Piştê çûyîna Hesan li gel Şahê Sefewî Îsmeaîl el Sefewî û xwe girêdayî wî kir, êrîşê Dasîn kir. Bi giştî Şêxan xist destê xwe û tevlî wilayeta xwe kir.

**52-Êrîşê Sultanê Osmaniyan Silêman Xan Qanunî ( Sala 1570'an )**
Fermane Sultanê Osmaniyan Silêman Xan Qanunî di sala 1570'an de hat destpêkirin û fetwa ji aliye muftiyê dewletê derket û tê de kuştin û dîlgirtina Êzîdiyan serbest kir û heya firotinên wan jî li sûkan helal kirin.

53- Fermane mîrê Botanê Elî Seydo Beg Di Sala 1585' an De
Di sala 1585'an de Mîrê Botanê Elî Seydo Beg, fermandariya arteşekî mezin kiribû, ev artêş berê xwe dabû Şengalê û li dijî Êzdiyan êrîş destpêkir. Di vê êrîşê de 600 Êzidî hatin kuştin û hijmarekî mezin ji jin û zarokan hatin revandin.

- **Fermanên sedsala 17'emîn (1600 - 1700)**

**56-Fermana Murad Paşa ( Sala 1607'an )**
Di sala 1607'an de jî serhildan li dijî Osmaniyan bi pêşengtiya Êzidiyan destpêkir. Ji van serhildanan jî Serhildana Elî Paşa Canpolatê Êzidî bû. Di hêza Êzidî de herî zede Êzidiyên Efrînê hebûn ku ji artêşa Murad Paşa ya Osmaniyan reviyabûn. Ev serhildan



bi avakirina hikumetekê bi encam bû, lê direj nekir. Di sala 1607'an de ji milê Murad Paşa ve artêşekî bi 40 hezar kesî hat amadekirin. Ev artêş ji Kurdên Qadirî ya Meraşê û Botanê ve pêk dihat. Armanca vê artêşê bidestxistina wilayeta Kîlîsê bû ku di bin serweriya Mîrê Êzidîyan Canpolat de bû. Di 24'ê Cotmeha sala 1607'an de êrîş destpêkir û şerekî giran li Deşta Aroj a nêzî Efrînê-Helebê qewimî. Di vî şerî de bi dehhezaran kes ji hêzên Mîr Elî Canpolat hatin kuştin. Her wiha Osmanî dest danîn ser bajarê Helebê û gelek cihên din ên Êzidiyan jî.

**57- Fermana Niduh Paşa ( Sala 1607'an )**
Osmaniyan, ji dema avebûna xwe ve her êrîş û fermanan li ser Êzîdiyan kirine. Di sala 1607'an de Niduh Paşa fermanekê li ser Êzîdiyan radike û êrîşê Şangalê dike, di vê êrîşê de serê 27 hezar Êzidiyan hate jêkirin. Lê bi kuştina7 hezar leşker ji artêşa Osmaniyan, Êzidî biserdikevin. Ji bo parastina xwe, Êzidî xwe dispêrin çiyayên Şengalê. Piştî ku Osmanî fêm kirin ew nikarin Êzîdiyên Şengalê bin bixînin, û ji ber ku Kurd bi şer kirina xwe dihatin naskirin, berê waliyên Amedê dan Şengalê.

**58- Fermana Qeraçîqey Xan ( Sala 1624'an )**
Di sala1624'an de Qeraçîqey Xan fermandariya fermanê kir û êrîşê Şengal kir. Pir kes hatin kuştin, jin û zarok jî hatin re-



vandin. Cih û warê Êzîdiyan heya Mardînê xistin bin desthilatdariya xwe û ev deran dagirkirin. Piştî wê, Qizilpaşiyan jî Mûsil û Kerkûk dagirkirin.

**59-Fermana Ehmed Xan Al-Sefewî ( Sala 1636'an )**

Ehmed Xan el Sefewî, êrîşê Êzîdiyan kir mal û milkê wan girt û hijmarên zêde kuşt û serkeftina xwe wekî mizgînî da Şah Abbas el Sefewî.

**60- Fermana Ehmed Paşa WaliyêAmedê(Sala1638'an)**

Di serdema Sultan Ibrahîm Qadir de, Waliyê Amedê Ehmed Paşa fermanekê li ser Êzîdiyan pêkanî. Hêza ku tevlî êrîşê bû 70 hezar kes bûn. Wan 13 hezar kuştin û 12 hezar jî esîr girtin ku hemû jî Êzîdiyên Şengalê bûn.

**61-FermanaQralEhmedPaşa li ser Şengalê ( Sala 1640'an )**

Ehmed Paşa dibêje: "Min çiyayên Şengalê dorpêç kir, êrîşê Şengalê kir. Min ji wan deh hezar kes kuştin û hijmareke zêde girtin." Sultan paşa piştî ku Şengal wêran kir û her tiştê wê talan kir dîsa berê xwe da Amedê.

**63- Fermana Şah Ehmed Paşa ( Sala 1650-1651'an )**

Piştî Murad Paşa, Şah Ehmed Paşa di navbera salên 1650 û 1651'an waliyê Amedê bû. Di nav Kurdan de weke dijminê mezin yê hemû wîlayetên Kurdan tê naskirin. Li hemberê Kurdan û îmaretên wan pir bi kîn bû, kîn û nefretê ji Êzîdiyan dikir. Di sala 1639'an de êrîşê Şengal kir. Wê demê waliyê Amedê bû. Di sala1656'an de bi hinceta hebûna Êzîdiyan di nav hêzên Bîdlîsê de, êrîşî Mîr Evdalê Bîdlîsê kir. Di rastiyê de jî Mîrê Bîdlîsê û Mîrê Êzîdiyan bi hev re li hemberî Osmaniyan dibûn alîkar. Ehmed

Paşa bi artêşa ji 40 hezar kesî, ji Amedê êrîşê Şengalê kir.

**64- Fermana Waliyê Wanê Şemis Paşa ( Sala 1650'an )**

Piştî îdamkirina Mîrê Êzîdiyan Mîrza Dasinî, di dema Sultantiya Muhemedê çaremîn de, Di sala 1650'an de Waliyê Wanê Şemis Paşa fermandariya fermanek gelek mezin li ser Êzidyan kir.

**65- Fermana Şemis Paşa li dijî eşîretên Êzîdiyan (sêbke – al-heyderiya)**

Şemis Paşa gelek dek û dolaban li ser Êzidiyan dabû meşandin. Yek ji wan jî ew bû ku daxwaz ji Êzidiyên derveyê sînorên Osmaniyan yên weke Ermenîstan û Rusyayê dikir ku vegerin gundên xwe, lê dema vedigeriyan yan bi darê zorê mislimantî li wan ferz dikirin, yan jî wan mecbûr dikirin ku her sal pereyekî gelek mezin pêşkêşî Osmaniyan bikin. Bi vî awayî civaka Êzidî dihatin xapandin. Ji ber ku hêza civaka Êzidî ne mezin bû nedikarîn li hember Şems Paşa serîhildin û bi vî awayî gelek Êzidî bûn misilman.

**66- Fermana Waliyê Amedê Mistefa Paşe Firarî ( Sala 1655'an )**
Waliyê Amedê Mistefa Paşa Firarî, sala 1655'an bi fermanekê ji Sultanê Osmanî gelekî ferman li ser Êzîdiyan rakir. Hemû jî bi awayekî hovane bûn. Şûn û warê wan talan û wêran dikirin jin û zarokan direvandin.

**67- Fermana Duyemîn a Mistafa Paşa ( Sala 1666'an )**
Di sala 1666'an de di bin fermandariya Mistafa Paşa de fermaneke duyemîn li ser êzîdiyan hate rakirin. Lê ev ferman bi ser neket û negihîşt encamekê.

**68- Fermana Sêyemîn a Mistafa Paşa ( Sala 1667'an )**
Mistafa Paşa dema ku cara duyemîn xwest ferman rake lê nekarî, careke din jî ferman li serê civaka Êzidî anî lê ev êrişa wî carek din jî bi serneket.

**69- Fermana Ehmed kurê Şêx Muhemed el Fedlonî ( Sala 1699'an )**
Ehmed kurê Şêx Muhemed, bi navê Mihdiyê derewker dihate naskirin. Hêzekê ji 50 hezar kesî avakir û dest danî ser hijmarekî gundan. Qubad Beg Mîrê Behdînanê, hêzekê şand ji bo pêşiya Mehdî bigirin, lê nikarîbûn zêde bimînin û binketin. Pişt re Êzidîyan alîkarî ji rêveberiya Mûsilê xwestin. Waliyê Mûsilê wê demê xwe gihand Êzidiyan û artêşek şand. Şer dirêj û bi xwîn qewimî û bi mehan berdewam kir heya ku Mehdî binket û hêzên wî reviyan.

**70-Fermana Kablan Paşa ( Sala 1674'an )**
Kablan Paşa xwest Êzîdiyên Şengalê bi binbixe. Ji bo wê jî hêzek amadekir û êrîşê Şengalê kir lê di destê Êzîdiyên Şengalê de binketineke mezin jiyan kir.

**71- Fermanên li ser hev li ser îmaratên Şam, Kilîs û Helebê di sedsala 17'emîn de**
Di encama siyaseta zilmdar û ne edaletî ya li ser Êzidiyan, Êzidiyên ku li Şam, Kîlîs, Heleb û Terblûsê de jiyan dikirin têkiliyên xwe bi Fransiyan re xûrt kirin. Fransayê soza alîkariyê dabû, lê bi şerta ku Êzidî 30 hezer leşkerên xwe tevlî artêşa Fransayê bikin. Bi vî awayî gelek Êzidî bûn leşkerên Fransayê bi taybet yên Çiyayê Semean û Helebê.

# Berxwedana 11 mehan hêviya jiyana azad geş kir



"Dibe ku îro fermana fizîkî nayê jiyîn lê belê ev ferman hê jî bi riya helandina çanda me berdewam dike. Lingê wê yê xurt jî Êzidyên Başûrê Kurdistanê yên ku di bin desthiladariya PDK'ê de ne. Hemû hêz bi armanca pûçkirina baweriya me û dûrxistina ji rastiya wê kar dikin û planên xwe çêdikin.

Li ser berxwedana 11 mehan a ku bi rizgarkirina bajarê Şengalê bi encam bû, her wiha rola civaka Êzidî, jin û ciwan çawa di vê berxwedanê de bi pêş ketin û bi taybetî jî vê berxwedanê bi jinên Êzidî re çi ava kir û der barê gelek mijarên din de Ajansa Nûçeyan a Jinê (JINHA), li gel Fermandara Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) Viyan Hebabî hevpeyvîneke taybet çêkir.

Fermandara YJŞ'ê Viyan Hebabî salvegera 7'emîn a rizgarkirina bajarê Şengalê li hemû civaka Êzidî bi taybetî jinên Êzidî pîroz kir û hemû şehîdên ku di vê berxwedanê de canê xwe feda kirine bi bîr anî. Viyan Hebabî diyar kir ku armanc bi wê fermanê ew bû civaka Êzidî ji kokê ve rakin û wiha dest bi nirxandina xwe kir: "Armanc bi wê fermanê ew bû ku civaka Êzidî ji koka wê tune bikin û li ser vê axê jî hebûna Êzidiyan bi dawî bibe. Ji bo ku ev yek pêk bê jî destpêkê DAIŞ'ê pîroziyên civaka me û jinên Êzidî kir hedefa xwe. Rast e weke civaka Êzidî me gelek ferman bi vê armancê dîtin lê vê carê planên wisa bûn ku bi temamî hebûna me, hebûna civaka me li ser rûyê erdê tune bikin. Ev jî ne tenê plana DAIŞ'ê bû, plana



dewleta Tirk, PDK'ê û hinek Erebên derdora Şengalê jî bû. Vê yekê hişt ku civaka Êzidî li hemberî hebûna xwe bêparastin û bêhêvî bimîne."

**'Heya niha jenosîd nehatiye nasîn'**

Viyan Hebabî diyar kir ku xeteriya fermanê hê jî berdewam dike û sedema vê yekê jî spart neqebûlkirina jenosîda Êzidiyan di cîhanê de. Hebabî wiha bilêv kir: "Dibe ku îro fermana fizîkî nayê jiyîn lê belê ev ferman hê jî bi riya helandina çanda me berdewam dike. Lingê wê yê xurt jî Êzidyên Başûrê Kurdistanê yên ku di bin desthiladariya PDK'ê de ne. Hemû hêz bi armanca pûçkirina baweriya me û dûrxistina ji rastiya wê kar dikin û planên xwe çêdikin. Ji ber vê jî heya roja îro fermana 74'an weke jenosaîd nehatiye qebûlkirin. Em jî weke civaka Êzidî ji ber van sedeman êşên di 2014'an de hê jî dijîn. Bi dehan gorên komî hê jî hene. Bi sedan yan jî hezaran jinên Êzidî winda ne. Ev hemû nayên jibîrkirin."

Viyan Hebabî qala kêliyên hatina gerîlayên Kurdistanê kir û gerîla weke çirûskên hêviya civaka Êzidî pênase kir û got: "DAIŞ'ê di dilê her kesê de tirseke mezin dabû avakirin lewma tu kesê xwe neda ber şerê bi DAIŞ'ê re. Vê yekê ne tenê li Şengalê hatibû jiyîn, li giştî Iraqê ev yek bi vî rengî bû. Mûsil di rojek de ket destên DAIŞ'ê û gelek cihên din jî, li Şengalê jî heman tişt bû. Lê bi hatina gerîlayên YJA STAR, HPG, YPJ û YPG'ê ve ji bo parastina Şengalê û li hemberî DAIŞ'ê şer bike çirûska hêviya jiyana nû dan civaka me. Li gel êşa di çavên civaka me de, hêviya vegera li jiyana xwe bi keda bi sedan şehîdan bû rastî. Îro jî em weke hêzên Şengalê deyndarên şehîdên berxwedana Şengalê ne."

**. Bi hatina gerîlayan, civaka me dît ku hêzek heye li ber xwe dide, bi vê hatinê rihê berxwedaniyê ku PDK'ê rizandibû careke din derket holê, şiyar bû û li gel hêzên gerîla bi sedan ciwanên Êzidî şer kirin. Ne tenê ciwan jin, zarok û kal, derfeta kê hebû wê demê bû lingekî ji vê berxwedanê re."**

**'Rihê berxwedanê bi gerîlayan geş bû'**

Hebabî got ku rihê berxwedanê bi hezaran salan e her




dem bi civaka Êzidî re hebûye lê ji ber siyaseta PDK'ê ev rih hatibû rizandin û got ku berxwedana gerîlayan, rihê berxwedaniyê ji xewa giran şiyar kiriye û wiha pêde çû: "Eger em li hemû fermanên berê binêrin, em ê bibînin ku rihê berxwedaniyê di civaka me de her dem hebûye û heye û tu carî jî ev ruh nehatiye kuştin. Lê di 2014'an de bi siyaseta PDK'ê ya qirkirinê re hêviya civakê lerizand. Ji ber ku tenê hêzên PDK'ê hebûn li Şengalê û ev civak bi wê hêzê pişta xwe şidandin. Lê mixabin bi xiyaneteke gelek mezin, civaka me tenê hat hiştin, ciwanên Êzidî xwestin şer bikin li hemberî DAIŞ'ê lê çek tunebûn, PDK'ê jî ne şer kir ne jî çek da ciwanên me ku parastina civaka xwe bikin. Bi hatina gerîlayan, civaka me dît ku hêzek heye li ber xwe dide, bi vê hatinê rihê berxwedaniyê ku PDK'ê rizandibû careke din derket holê, şiyar bû û li gel hêzên gerîla bi sedan ciwanên Êzidî şer kirin. Ne tenê ciwan jin, zarok û kal, derfeta kê hebû wê demê bû lingekî ji vê berxwedanê re."

'YJŞ'ê ji YJA-Starê îlham girt'

Fermandara Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) Viyan Hebabî destnîşan kir ku êşa jinên Êzidî di fermanê de kişandibû, bû sedema bihêzbûn û artêşbûna jinên Êzidî. Hebabî wiha domand: "Jinên Êzidî dema dîtin ku êrîşa herî giran li ser wan e û li ser bedena wan ferman pêk tê, li riya rizgarbûyînê geriyan. Tiştên ku hatin jiyîn kirin bi taybetî jî jinên ku di destên DAIŞ'ê de mabûn û rizgar bûn, derûniyekî gelekî giran ava kir. Ne tenê bi jinên Êzidî re bi hemû civaka Êzidî re ev derûniya tirsê belav bû. Ji bo jinên Êzidî jî riya xilasbûyînê heyfa xwe û tola xwe rakirin bû. Bi îlhama ku ji hêzên YJA STAR'ê girtin, YJŞ ava bû. Avabûna YJŞ'ê jî bersivdayîna fermanê bû. Ji bo tola xwe bigrin YJŞ beşdarî hemleya rizgarikirina Şengalê bû, heya Reqa û Minbicê çû. Yanî YJA

**îro bi şerê taybet gelek hêz dixwazin bawerîya me pûç bikin û ber bi tunebûnê ve bibin, tenê bi yekitiyê civaka xwe û tifaqê em ê van êrîşan hemû vala derxin. Em Êzidî hatine dinyayê em ê Êzidî li ser vê axê jî bimrin. Hêzbûna me bi yekitiya me ye.**

STAR bû îlhama YJŞ'ê, û YJŞ jî bû îlhama hemû jinên Êzidî."

Berxwedana 11 mehan bû hêza rizgarkirinê

Viyan Hebabî di dirêjahiya nirxandina xwe de îşaret kir ku berxwedaniya rizgarkirina bajarê Şengalê hêviya parastina Şengalê veguherand rastiyê û got: "Berxwedana 11 mehan a li bajarê Şengalê pêk hatibû bi fedakariyeke mezin bi pêş ket, bi rihekî cesûr û qehremanî bû. Her bihustek ji bajarê Şengalê bi taybetî jî Sûka Kevin a Şengalê bi xwîna şehîdan hat rizgarkirin. Ji bo me weke civaka Êzidî ev cihê berxwedaniya 11 mehan ket dîroka civaka me ya ku tu car nayê jibîrkirin. Rizgarkirina bajêr, hêviya jiyana nû ya civaka me geştir kir û bi wê hêviyê jî bi tevlibûna ciwanên Êzidî hemleyên rizgarkirina tevahiya Şengalê dest pê kir."

Der barê planên PDK'ê yên li hember siyaseta ku li Şengalê dimeşîne û hewldana PDK'ê ya ji bo veşartina rûyê xwe de Viyan Hebabî wiha got: "Hê me bajarê Şengal nû rizgar kiribû û piştî wê me yê pêngava paqijkirina bajêr bida destpêkirin, PDK'ê weke her carê nizanibû çawa rûreşiya xwe veşêre, vê carê jî bêyî ku şerm bike li ser ragihandinê derketin û gotin ku wan Şengalê rizgar kirine! Eger weke ku îdia dikin rast be, kanê şehîdên we yên di berxwedaniyê de? Kanê şehîdgeha we heye gelo? Kanê birîndarên vê berxwedanê? PDK'ê xwe winda kir. Li şûna ku bê lêborîna xwe ji civaka me bixwaze bi hemû rêbazan êrîşê civaka me dike."

Viyan Hebabêı bal kişand ku bi berxwedana Şengalê rûmeta Iraqê jî hatiye parastin û wiha anî ziman: "Berxwedana ku li hemberî vê fermanê bi pêş ket, tecrubeyeke gelekî mezin da jinên Êzidî. Ya herî mezin jî tecrubeya bikaranîna çekê bi jinên Êzidî re çêbû, rihê berxwedanê xurt bû. Ji xwe bawer bû û heya derveyê Şengalê ji bo tola xwe bigire şer kir. Ev rihê berxwedanê yê li Şengalê bi pêş ket bandorê li hêzên Iraqê jî kir û ji wan re bû mînak ku li bajarên din ên Iraqê li hemberî DAIŞ'ê şer bikin. Berxwendaniya Şengalê rûyê Iraqê spî kir û rûmeta wî parast. Lê mixabin hikmeta Iraqê ne di ferqa vê yekê de ye. Nabîne hê jî nedîtiye û ew ê kengî vê rastiyê bibîne ne diyar e. Ji fermanê heya niha hikumeta Iraqê li hember mafê civaka me kêm maye. Lê herî kêm ev hikumet pêwîst e li hemberî êrîşên hewayî bêdeng nemaya."

Ji pêşengiya berxwedanê ber bi parastina hebûnê ve

Viyan Hebabî îşaret bi hêza jinên Êzidî kir ku roja îro pêşengiya herî mezin ji berxwedaniyê re dikin û ev hêz bi vê awayê pênase kir: "Yên ku heya roja îro hişt Şengal li ser lingan bimîne ruxmî hemû dek û dolabên PDK'ê û dewleta Tirk jî jinên Êzidî bûn, dayikên me bûn. Di şerê Xanesorê de wan pêşengiya berxwedani-




**Berxwedana ku li hemberî vê fermanê bi pêş ket, tecrubeyeke gelekî mezin da jinên Êzidî. Ya herî mezin jî tecrubeya bikaranîna çekê bi jinên Êzidî re çêbû, rihê berxwedanê xurt bû. Ji xwe bawer bû û heya derveyê Şengalê ji bo tola xwe bigire şer kir.**

yê kirin. Nepêkanîna peymana 9'ê Cotmehê jî bi hêza berxwedaniya jinên Êzidî û pêşengiya dayikên me bû. Li hemberî hêza berxwedanê gelek alî dixwazin hêza dayikan reş bikin. Kîna jinên Êzidî ku di 2014'an de li hemberî dijmin pêş ket heya roja îro bi wê kînê xwe bi rêxistin dikin. Di salvegera 7'emîn rizgarkirina Şengalê de tevgera azadiya jinên Êzidî wê kongreya xwe ya duyemîn li dar bixe. Ev pêngaveke gelekî mezin û bi hêz e û bersiva hemû êrîşên roja îro ye."

Fermandara Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) Viyan Hebabî, di dawiya nirxandina xwe de bang li civaka Êzidî kir ku li hemberî metisiya windabûna civaka Êzidî xwedî helwestên tund bin. Hebabî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Civaka me ya Êzidî di roja îro de eger li ber parastina baweriya xwe bê helwest be wê rewşa civaka me ber bi xeteriyê ve biçe. Ji ber îro bi şerê taybet gelek hêz dixwazin baweriya me pûç bikin û ber bi tunebûnê ve bibin, tenê bi yekitiyê civaka xwe û tifaqê em ê van êrîşan hemû vala derxin. Em Êzidî hatine dinyayê em ê Êzidî li ser vê axê jî bimrin. Hêzbûna me bi yekitiya me ye. Em ê bi xwe qîmeta xwe ava bikin û giraniya xwe jî biparêzin."

# Avesta: Divê li Şengalê yek jin bi tenê jî bê rêxistin nemîne



Tevgera Azadiyê Jinên Êzidî (TAJÊ) bi ruhê rizgarkirina Şengalê û felsefeya 'Jin, Jiyan, Azadî' bi dirûşmeya, 'Emê xwe ji fermanê biparêzin, azadiya jin û civakê mîsoger bikin' di 13'ê Mijdarê de li Şengalê 2. Kongreya xwe lidar xist. Ji derveyî Şengalê û nav Şengalê, ji bo silavkirina kongreyê gelek peyam hatin şandin. Yek ji van peyaman ku mohra xwe li Kongreya TAJÊ da, peyama Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Sozdar Avesta bû.

Sozdar Avesta di destpêka peyama xwe de şehîdên têkoşîna azadiyê bi bîr anîn, berxwedana gerîla ya li hemberî dagirkeriyê silav kir. Her wiha diyar kir ku yên heta niha nehiştine Şengal bikeve destên dijminan, jin û ciwan in. Sozdar Avesta bi navê Tevgera Azadiya Kurdistanê 2. Kongreya TAJÊ silav kir û got: "Li ser navê tevgerê ji Herêmên Parastina Medyayê em we silav dikin. Di şexsê rêheval Bêrîvan, Arîn, Nazê, Nujiyan, Nûjîn, Hêlîn, Nêrgiz û Mamê Êzidîxanê Mam Zekî, hevalê Seîd, Dijwar û Zerdeştan û hemû şehîdên Êzidîxanê ku ji bo parastina rûmeta mirovahiyê û rizgarkirina jinên Êzidîxanê şer kirin, em hemû şehîdên Tevgera Azadiyê bi bîr tînin. Ên ku fermana rizgarkirina Şengalê û gelê Şengalê ji bo xwe wek rûmet girtin dest û gotin, 'em ê tola jinên Êzidî hildin' û xwe weke xizmetkarek xeta azadiya jinan dîtin em wan silav dikin. Ji Başûr heya Rojavayê Kurdistanê gerîlayên azadiyê, yekîneyên parastinê YPG û YPJ bi hawara civaka me ya Êzidî ve hatin û civaka me ji qirkirinê rizgar kirin. Ez di şexsê wan berxwedêran de, berxwedana li Metîna, Zap



û Avaşîn û hemû qadan silav dikim, berxwedana wan pîroz dikim."

**'Dijmin dixwaze malan ji xwe re bike navendên sîxuriyê'**

Sozdar Avesta di peyama xwe de balkişand ser berxwedana jinên Êzidî û wiha domand: "Di van salan de berxwedaniyeke pir mezin di pêşengiya we de hat meşandin. Hûn her roj li kolanan bûn, li ser riyan bûn, we çek da ser milên xwe û ketin çeperan. Mal bi mal geriyan û gel bi rêxistin kirin. Dem hat bi şev û roj we çekên xwe hilgirt û berê xwe da çeperên din. We gelek lehengên xwe bi tilîliyan oxir kirin, ev rûmet û serkeftineke mezin e. Wê tu kesek nikaribe vê yekê asteng bike. Îro careke din kombûna we li ser pratîk û xebatên hatine kirin e. Li Şengalê mal bi mal pêwîst e jinek tenê jî bê rêxistin nemîne, ger heya niha li Şengalê mabin jî divê çareserî were dîtin. Dijmin dixwaze malan ji xwe re bike navendên sîxuriyê. Di serî de TAJÊ divê xwe li dijî van xeteran berpirsiyar bibîne û wan ji wê riyê vegerîne. Kongre pêwîst e li ser vî esasî biryarên girîng bigire û biryar bide ku xwe çawa ji fermanan biparêze."

**'Jinên bê parastin bi mirinê re rûbirû dimînin'**

Her wiha ji bo jinên Êzidî bikaribin li hemberî hemû fermanan rawestin û bibin bersiv ji dijmin re, Sozdar Avesta diyar kir ku divê careke din rastî qirkirin, destirêjî û fermanan neyên, li kolanan neyên firotin, tedbîrên pêwîst werin girtin û peyama xwe wiha bi dawî kir: "Erkên esasî yên vê kongreyê, rêxistinkirin e, yek jî parastina cewherî û pêşxistin e. Parastina jin û rêxistinkirina wan pêwîst e. Jinên bê parastin bi mirinê re rûbirû dimînin. Pêwîst e ezmûna we ya 8 salan û îradeya we ya mezin di vê kongreyê de baş were birêxistinkirin û jin jixwebawer bin. Ji hêz û fikrên ku we xwe li ser bi rêxistin kirine bawer bin. Pêwîst e hûn ji serhildanên mezin ku îro li Rojhilatê Kurdistanê bi pêşengiya jinan didomin jî bawer bikin. Li hemberî kesên ku dixwazin jinan bixapînin û şerê taybet li ser wan didin meşandin pêwîst e hûn bibin xwedî helwest û keçên ciwan birêxistin bikin."

# Spasiya hevgirtinê: Nanê Dengê Şevê



Li ser axa pîroz rê û resmeke din, ev rê û resim jî cardin di encama dilpakiya vê civakê derketiye pêş. Nanê Dengê Şevê jî rê û resmeke wiha ye ku di encama fermanekê de ji bo hevgirtinê derketiye holê ye.

**EVÎN ZENDA-JINHA**

Li ser daxwaza micewirên Quba Şêx Mend, me berê xwe da Qubê bi sedan kes li wir kom bibûn. Tev ferdên Eşîra Simoqiyan û nasên wan bûn. Hemû li dora hev kom bibûn û li benda çêbûna Nanê Dengê Şevê bûn. Em bi hev re binêrin ku ev rê û resmê kevnar Nanê Denê Şevê ya xwe dispêre spasiya hevgirtinê û her sal di vê mehê de roja çarşemê tê pêşwazîkirin çawa bipêş ketiye.

**Fermana Osmaniyan**

Di sala 1898'an de dewleta Osmanî fermanekê dibe li ser Şengalê û komkujiyan pêk tîne, civaka Êzidî ji bo xwe ji fermanê biparêzin careke din rêya koçberiyê dabûn pêşberî xwe. Wê demê rêwitî ber bi Rojavayê Kurdistanê ve bû. Malbata Dayika Xanê xwe xelas dike û bi çar kurên xwe ve diçe mala yek ji mezinên Eşîra Cibur Mihemed Emîn Mislit, ew malbata hêja ji bo Dayê Xanê û zarokên wan nanekê taybet çêdike.

**Bi şev qîr kir û kir xêr**

Xwediyê malê şeva ku wê nanê çêdikin diçe ser ban, qîr dike û dibêje; "Heçî kesê birçî keremkin werin mala me nan bixwin." Dayê Xanê ji vê nêzikariya malbatê pir bandor dibe û ji lawên xwe re dibêje: "Ger em bi sax û silametî vegeriyan warê xwe soz bidin min ji bo vê qenciya malba-

**Çar hevîr em çêdikin û em bi dohnî disitirin û bi agirê daran diqelînin, dema amade bû em tev wê datînin erdeke paqij û li dorê kom dibin her kes wî nanî pîroz dike û dua û sozên yekbûnê didin hev**

ta ku li me kirî em ê her sal Nanê Dengê Şevê çêbikin. Ji bu ku em başiya wan ji bîr nekin." Di wê demê de Dayê Xanê navê nan dike 'Nanê Dengê Şevê' di heman demê de civak ji vê nanê re jî dibêje 'Nanê Şêx Mend'

**Nanek û peymanek**

Ya ku van mirovan tev li vir kom kir ne tenê nanek e, lê nanek e ku bûye wesîleya ku malbata Dayê Xanê hesta xwe ya spasdariyê pêşkêş bikin. Ev çanda Nanê Dengê Şevê, sed sal zêdetir ji zarokên Dayê Xanê derbasî nevî û nevîçîçirkên wê bûye. Çoş û merasima îro bi me da hiskirin ku wê ev rê û resim jî qet neyê ji bîr kirin û wê her were bibîr anîn.

**Deng û peyvên cûda lê heman daxwaz**

Li dor nanê ku ji her temenê mirov lê kom bibûn, hemû jî hêviyên xwe daxwazên xwe digotin bi dehan dengên cuda, peyvên cuda. Lê heman daxwaz kêliyeke pir bibandor bû, ji bo wê çend kêliyan min çavên xwe girt û bi baldarî li dengan guhdar dikir, wan hevokên xwe bi hesteke mezin wiha rêz dikirin:

"Xêra navê xwedê û xêra xwedanê me
rebil alemîn berserê rihên Êzidî bigere
ya Tawisê Melek li Êzidiyan neke tengî
Şerfedîn rihên Êzidî bi destê hamê de nesipêrê
deriyekê xêrê veke li lacê, dewleta ber hemûyan veke,
van eşîrên rengîn weke berê bigehine yek û
weke berê Qunaxên qewala bîne nava me bigerîne.
xweşî û rengê biharê li gelê me belav be."

Dayê Bêzar Milko ku wê jî di çêkirina vê nanê de ked daye daxwazên xwe bi van gotinan anî ziman: "Tawisê Melek vê nanê li dîwana xwe ji me re weke xêr binivîse. Bereketê bavêjê kêm neke, Şêx Mend me tevan bisitirîne. Ya Tawisê Melek ya baş ji dinyayê re bike xweşiyek bikeve nava me tevan bi heft gayan û heft beranan."

**Her kes pariyekê jê dixwe**

Dayê Gulê Xidir ku salên berê hevalê wê ev nan çêdikir niha erka çêkirina nan daye ser milên xwe dibêje: "Her sal roja çarşemê di vê mehê de em vê nanê çêdikin, eşîra Simoqiyan vî nanî çêdike. Çar hevîr em çêdikin û em bi dohnî disitirin û bi agirê daran diqelînin, dema amade bû em tev wê datînin erdeke paqij û li dorê kom dibin her kes wî nanî pîroz dike û dua û sozên yekbûnê didin hev. Li du wê dohnê pez sordikin û lê direşînin her wiha hingivê jî lê dikin piştî wê her kes pariyekê jê dixwe ew nan li sedan kesan tên gerandin."

Civaka Êzidî civakeke wiha ye ku başî û qenciyên ku li wan hatine kirin ji bîr nake Nanê Dengê Şevê jî Sembola vê yekê ye.

# Encamname û biryarên 2.Kongreya TAJÊ



2. Kongreya Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ), di 13'ê Mijdarê de ango di salvegera rizgarkirina navenda Şengalê de hate lidarxistin.

Encamnameya 2. Kongreya TAJÊ wiha ye:

"Ji ber ku destûr nehat dayîn delegeyên ji derveyî Şengalê tevlî kongreyê bibin, bikevin Şengalê, ji ber vê yekê ev delege nekarîn beşdarî Kongreyê bibin. Ji ber ku kongre di roja rizgarkirina Şengalê ya ji destê çeteyên DAIŞ'ê de hate lidarxistin, diyarî gerîlayên azadiyê, şehîdên Şengalê yên ku di rizgarkirina Şengalê de rolek aktîf lîstin û îro li hemberî êrişên çekên kimyawî yên ku dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê bikartînin berxwedaniyek mezin nîşan didin, hate kirin.

Kongre di dema êrişên dijwar ên keşfê û êrişên dewleta Tirk de pêk hat û li dijî êrişên dewleta Tirk û hevkarê wê PDK'ê bi îradeyeke rêxistinbûyî û berdewam hate lidarxistin. Jinên Êzidî di kongreyê de silav û heskirinên xwe ji Rêber APO re şandin û tecrîda girankirî ya li ser Rêber APO weke tecrîda li ser jinên Êzidî tê meşandin nirxandin. Di vê çarçoveyê de soza xwe nû kirin û hate diyarkirin ku heta tecrîda li ser Rêber Apo ranebe û azadiya fizîki ya Rêber Apo bidest nexin wê bênavber tebikoşîn û rêxistinbûna xwe ya esasî mezin bikin.

Li Şengalê yek jin bêrêxistin nemîne

Di nîqaşên rojeva siyasî ya kongreyê de, êrişên dewleta Tirk û hevkarê wê PDK'ê yên li dijî Şengalê û armanca van êrişan bi berfirehî hatin nirxandin. Hate diyarkirin ku armanca van êrîşan derxistina Êzidiyan ji Şengalê û koçberkirina Êzidiyan e û weke jinên Êzidî biryardariya wan a li hemberî vê yekê rawestin û ji bo pûçkirina van polîtîkayan hemû jinan bi rêxistin bikin derketiye holê. Dîsa di şexsê Jîna Emînî de têkoşîna jinên Rojhilatê Kurdistanê ku bi dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' têkoşîna xwe ya azadî û berxwedanê didomînin, hate silavkirin. Di kongreyê de sînevîzyona Endama Konseya

Hevserokatiya Giştî ya KCK'ê Sozdar Avesta hat temaşekirin û peyama KJK'ê hat xwendin. Perspektîfa tevgera azadiya jinên Êzidî ku rêxistinbûna xwe berfireh bike û bi şîara "Li Şengalê yek jin bê rêxistin nemîne" tevbigere derketiye pêş.

Di kongreyê de rewşa jinên Êzidî jî hate nirxandin. Li ser pirsgirêkên civakî, rêxistinî, bîrdozî, siyasî û aborî yên jinên Êzidî nîqaş hatin kirin, tevî hemû zehmetiyan jî, piştî fermanê di nava 8 salan de weke jinên Êzidî kedeke mezin dan. Li dijî hemû nêzîkatî û pêkanînên ku ferz dikin statûya Şengalê bizivîrinin beriya fermanê, helwest hate girtin, tevlî hemû çalakiyên ku hatine organîzekirin bûye û pêşengtî kir. Weke jinên Êzidî di heman demê de xwedî îradeya xweparastin û rêxistinbûnê ne. Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) bi birêxistinkirina xwe di komîn, meclîs û hemû qadên jiyanê de bûye nasnameya jinên Êzidî. Bi bawerî û hêza xwe ya pêşengtiyê hemû jinên Êzidî hembêz dike. Her wiha di pêşxistina hevkarî û rêxistinbûna jinên ji neteweyên cuda yên li Şengalê hêza pêşeng e. Tevgera




Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) ku xwe di hemû qadên jiyanê de birêxistin dike, di çarçoveya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê, li dijî pirjinî, zewaca di temenê biçûk de, next, komkujiyên jinan û xwekuştinê de pêwîstiya bilindkirin û xurtkirina têkoşînê derxist holê.

**Dewreyên perwerdê yên meran werin vekirin**

Hate diyarkirin ku pirsgirêkên civakî û nêzîkatiyên zayendperest ên li hemberî jinan di her qadê de yek in û ji bo têkoşînê bi awayekî radîkal, xurtkirina rêxistinbûnê, giranî ji xebatên bîrdozî, bi konferans, semîner, komxebat û xebatên akademiyê re pêwîst e. Ji bo hevjiyana azad bi qasî jin tên perwerdekirin, divê mêr jî werin perwerdekirin. Biryar hate girtin ku di vê mijarê de dewreyên perwerdê yên mêran bên vekirin.

Di kongreyê de biryardariya berdewamkirina têkoşînê ya ji bo qebûlkirina sîstema Xweseriya Demokratîk ya Şengalê hate nîşandan.

Dema ku êrişên di bin pêşengiya DAIŞ'ê de weke jinkujî û qirkirin tê qebûlkirin, di qada navneteweyî de jî weke komkujî û qirkirina jinan tê qebûlkirin, dîsa dewleta Tirk û PDK'ê ji ber êrîşên xwe yên hem di pêvajoya DAIŞ'ê de û hem jî di pêvajoya piştî DAIŞ'ê ku di pêvajoya avakirina Xweseriya Demokratîk de pêkanîne di dadgehên navneteweyî de weke sûcdarên şer bên darizandin û cezakirin xebatên xwe yên dîplomatîk û hiqûqî bi pêş bixe û tola fermanê

hilîne. Di kongreyê de biryar hate girtin ku encamnameya TAJÊ were erêkirin, bi girtina biryaran û guhertina alê hat dayîn, meclisa ku hat avakirin soza xwe dan.

Kongre bi dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' û 'Bijî berxwedana Şengalê' bi dawî bû."

**Biryarên ku di çarçoveya hemleya "Dem dema azadkirina jin û civakê ye" de hatine girtin:**

-Ji bo fikir û felsefa Rêber APO bê fêmkirin kar û xebat dimeşîne, êrîşên li hember Rêber APO wek êrîşen li hemberî xwe digire dest û helwest pêşdixîne. Ji bo azadiya fizîkî ya Rêber APO pêk were têkoşîn û xebatên xwe pêşdixe.

-Hevalên ku di rizgarkirina Şengalê de pêşengtî û têkoşîn kirine û şehit ketine, di şexsê heval Şîlan Goyî, Nûjîn Koçer, Amargî, Faraşîn de weke sembola xwedîderketina girêdana bi çanda kevnar re hatine destnîşankirin. Heval Egîd, heval Seîd, heval Dijwar û heval Azad weke sembola di têkoşîna azadiyê de rêhevaltiya rast bi jinê re tê kirine hatine destnişankirin.

-Ji bo avakirina pergala civaka demokratîk, rêxistinkirina komînan û xurtkirina meclisên qadê kar û xebat werin meşandin.

-Ji guhertin û veguhertina zihniyeta mêr ya desthilatdar, TAJÊ wê dewrên perwerdê yên mêran birêxistin bike.

-Li hember zewaca pirjinî, di temenê biçûk de zewicandîn, zewaca li derveyi îradeya jinê, têkoşîn hin zêdetir werin pêşxistin.

-Di dîroka civaka Ezîdî de jinên pêşeng ên weke Zarîfe Ose, Dayê Zero, Meyan Xatun, Sîtya Nîsra, Stîya Ez, Stîya Neqşa û her wekî din, li ser wan lêkolîn bêne çêkirin, bi rîya hûner, çapemenî, civîn, perwerde bêne rojevkirin. Di dawî de ev xebat bibin pirtûk û bêne çapkirin.

-Kesên ku di qirkirina gelên Ezîdî de, esîrgirtin û firotina jînên Ezîdî de cih girtine yan jî destê wan tê de heye, li hember wan tekoşîn bê bilindkirin. Ji bo ku bêne dadgehkirin hem li herêmê hem jî di qada navnetewî de bingehên ku dadgehkirina wan bê çêkirin bi awayek domdar xebat bên şopandin û xurtkirin.

-Fermana 74' an di qada navnetewî de ji bo weke jenosîd were qebûlkirin têkoşîn were meşandin.

-Hemû serlêdan û daxuyaniyên ku ji bo DAIŞ bê dadgehkirin, piştgirî bê dayîn û ji bo ku di wan cihan de jî bi rengekê domdar tevlîbûn çêbibe, di biryara li hember DAIŞ'ê de nêrîna jina Êzîdî hebe xebat bên meşandin.

-Çîrokên jinên ku ji destê çeteyên DAIŞ hatine rizgarkirin bên nivîsandin, li gorî îmkanan ev pirtûk wergêrê zimanên bîyanî jî bê kirin.

-Xebat û komîta aborîya jinan bê xurtkirin. Li her cihên ku jinên Ezidî lê hene rêxistînên aborî bên pêşxistin. Hedef ew be ku jin, debara xwe bi xwe bikin. Ne mihtacî tu kesî bin.

-Jinên ji destê çeteyên DAIŞ'ê tên rizgakirin û radestî malbatê bê kirin, li hember siyaseta esîra derxistina derveyî welat û Şengal valekirinê, têkoşîn bê pêşxistin. Jinên esîr ji bo ku li Şengalê ser axa xwe bimînin û jiyaneke bi ewle, azad û demokratîk jiyan bikin bingeh bê amadekirin.

-Rêxistinên jinên ciwanên êzîdî, xwe gehandina tevahî jinên ciwan ên Ezîdî hedef dike. Jinên ciwan perwerde dike, rêxistin dike ji bo îrada jinên ciwan pêşbikeve xebatên xwe di aliyê siyasî, civakî, parastin, perwerde, çand û werzîşî de kûr dike."